# Berhevkirina axaftinên

# FORUMA ŞOREŞA JIN

BI HEVGIRTINA JINAN EMÊ DESTKEFTIYÊN ŞOREŞÊ BIPARÊZIN Û GEŞ BIKIN



Jineoloji

## Berhevkirina axaftinên Foruma Şoreşa Jin

Di vê broşûrê de me axaftinên ku di foruma şoreşa jinê de hatin kirin berhev kir.

Di 19’ê Tîrmeha 2022’an de şoreşa jinan a Bakur û Rojhilatê Sûriyê 10’emîn salvegera xwe pîroz kir. Rêxistinên jinan ên Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi hev re forumek bi boneya 10 salên şoreşa jinan li dar xistin. Forum ji aliyê Kongra Star, Kombûna Jinan a Zenobiya, Meclisa Jinên Suriyan, Meclisa Jin a Bakur û Rojhilatê Sûriyê, Meclisa Jin a Sûriyê û Akademiya Jineolojiyê ve hate organîzekirin û di 22 û 23’ê Tîrmeha 2022’an de li salonên Zanîngeha Rojava pêk hat. zêdetirî 200 jin ji seranserî Sûriyê beşdar bûn. Dirûşmeya forumê ev bû: Bi hevgirtina jinan em ê destkeftiyên şoreşa jinê biparêzin û geş bikin. Di forumê de rewşa jinan a beriya şoreşê û piştî şoreşê hat nirxandin, têkoşîna jinan a 10 salên dawî hat nirxandin û bi hev re siberoja hatin nîqaşkirin.

Em vê forûmê û vê broşûrê li ber we diyarî Şehîd Jiyan Tolhildan, Şehîd Roj Xabur û Şehîd Barîn Botan li ser navê hemû jin ên ku ji bo şoreşê canê xwe dane dikin.

Fermandara YPJ'ê Jiyan Tolhildan di roja yekemîn a forumê de weke axaftvan beşdar bû û li ser YPJ'ê û jinên di nava xweparastinê de axivî. Bi Roj Xabur û Barîn Botan re weke delege û nûnera YPJ’ê beşdarî forumê bû. Di roja duyemîn a forûmê de ji ber ku ji roja ewil a forumê dema vedigeriyan de rastî êrîşa balafirên bêmirov ên dewleta Tirk a faşîst hatin û şehîd bûn, di roja duyemîn a forumê de amade nebûn.

Fermandar Şehid Jiyan Tolhildan di axaftina xwe de ev tişt anî ziman: 'Em weke YPJ'ê soza xwe ya ji bo vê forumê û hemû jinan nû dikin. Heya êrîş li ser jinan hebin em ê çeka xwe bi xwe re hilgirin. Gav bi gav, ber bi pêş em ê vê herêmê azad bikin, em soz didin dost û dijminên xwe. Bêguman ev şoreş wê ji bo jinên cîhanê bibe rastî.'

Şehîd Jiyan Tolhildan û rêhevalên wê ji bo vê şoreşê jiyan kirin û şehîd ketine. Bi vê bîr û baweriyê hemû beşdarvanên wê forumê soza şopandina rêya hevalên xwe yên şehîd dane da ku xeyal û hêviyên wan pêk bînin. Şehîd di têkoşîna me de, di dilê me de û di destkeftiyên şoreşa jinê de nemir in.

## Axaftina vekirinê ya Foruma Şoreşa Jinê ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê

Remziye Mihemed - Berdevka Kongra Star

Em bixêrhatina hemû jinên ji Rojava, Bakur û Rojhilatê Sûriyê, jinên ji çar aliyên Sûriyê û Rojhilata Navîn ên ku îro di vê foruma şoreşa jinê de cih digirin, dikin. Destpêkê de em şoreşa 19'ê Tîrmehê li hemû gelê xwe û hemû jinan, di serî de malbatên şehîdan, hevrê û zarokên şehîdan pîroz dikin.

Îro em dikarin li 10 salên şoreşê yên  dagirtî bi ked, xebat û têkoşînê bi pêşengiya jinê binerin, 10 salên ku bi serketî bi dawî bûne. Em derbasî sala 11'ê mîn dibin. Sal bi sal bi serketinên mezin û xebateke xurt derbas bûn ji ber wê pêkan e ku îro jin ji kom û rêxistinên cuda ji çar aliyên Sûriyê li vir amade bibin. Bi yek dengî, yek rengî, yek xebatê şoreşa xwe û destkeftiyên wê bînin ser ziman û geşkirina şoreşê ku ji me tê xwestin. Çirûska şoreşê ji Kobanê destpêkir, lê ev çirûsk roj bi roj herikî wekî çemekî li tevahî Rojavayê Kurdistanê û Bakûr û Rojhilatê Sûriyê belav bû. Armancê me ku şoreş bibe malê tevahî Sûriyê. Jinên Sûriyê pir zordestî ji destê Daiş dîtin, pir êrîş û siyaset ser wan hate meşandin lê her berxwedaniyê hebû, her pêşengtiya jinan hebû. Ev pêşengtî mîrasê zêdeyî 30 salî ye ku pêşengtia jina Kurd kiriye, lê me xwest ew bibe mîrasê jinên tevahî Sûriyê da ku jê sûd bigirin. Bi hevgirtin û tekoşîna jinan em ancax dikarin şoreşa xwe biparêzin û geş bikin.

Em gîhan merhaleyekî ku em destkeftiyên û şoreşa xwe ne tenê biparêzin, lê xwedî li wan destkeftiyan derkevin. Em hemû dizanin ji ber jin pêşengtiya şoreşê kiriye her êrîş û siyasetên pir giran li ser jinan tê meşandin, mînakê wê jî jinên pêşeng ku tên hedefgirtin wekî Hevrin Xelef, Zehra, Yadê Emîne, Hebûn, Hind û Saade. Armanca hedefgirtina wan  qirkirina jina û qirkirina gelê heremê bû. Nirxên şoreşa me Şehîdin, Şehîden kû efsaneyên Bakûr û Rojhilatê Sûriyê nivisandin, wekî Arîn Mîrkan, wekî Barîn û Avesta, wekî Silava Şehîda yekêm li Afrînê. Şoreş li hemû bajarên Bakur û Rojhilatê Sûriyê belav bû. Roj bi roj dema bajar hatin rizgarkirin, jinên van bajaran şervanên YPJ'ê weke çirûska azadiyê dîtin, ew dizanin ew jin in ku bi hemû hêz û xwîna xwe şoreşê diparêzin û jinan azad dikin.

Gav bi gav hemû jinên Bakur û Rojhilatê Sûriyê hebûna xwe nîşan dan û xwe bi rêxistin kirin. Roj bi roj pêkateyên heremê di warê siyasî û civakî de xwe bi rêxistin kirin. Wan karîn di qada civakî de xwe bi rêxistin bikin û di şoreşê de roleke girîng bilîzin. Mînaka vê ya herî baş jî sîstema Rêveberiya Xweser e ku gel bixwe bi rêxistin kir û hebûna xwe da diyar kirin. Jinan, di hemû pêvajoyên biryardanê de cihê xwe girtine û karîbûn pergala Hevserokatiyê bidin îspat kirin. Û hat îspatkirin ku jin ne tenê duyemîn û sêyemîn in, dikarin bibin nûnerên me jî.

Hêviya tevahî jinên ku îro li vir hazir in an jî li ser înternetê guhdarî dikin ew e ku em şoreş xurt bikin. Hêviya me ji hemû jinên hazir ew e ku encama vê forumê ew be ku em bi hev re hêviyên gelan pêk bînin, şoreşê xurt bikin û xwedî li xeyalên şehîdan derkevin. Bi vê minasebetê em careke din bi xêrhatina we hemûyan dikin. Em 10'emîn salvegera şoreşa 19'ê Tîrmehê li hemû jinan pîroz dikin. Em li hemû gelên Sûriyê û cîhanê pîroz dikin. Em bixêrhatina we dikin.

## Nirxandina Rewşa Siyasî ya Cîhanê û Herêmê

Foza Yûsif - Endama Desteya Hevserokatiya Partiya Yekîtiya Demokratîk PYD'ê

Rojbaş! Bi rastî, dîtina we hemûyan îro li vir hêvîyê dide min ku em bi jinan dikarin cîhanek pir geş ava bikin. Ji bo vê yekê ez bi germahî xêrhatina we hemûyan dikim. Û em hêvîdar in ku ev forum ji bo şoreşa me û pêşeroja me encamên pir girîng derxe holê.

Ser destpêkirina vê şoreşê 10 sal derbas bûn, 10 sal me tekoşînek dijwar da, 10 sal de şerekî pir mezin hat kir. Di wan 10 salan de me gelek bedel dan, wekî jin jî em gelekî şahnazin ku me bedel ji bo azadiya xwe da. Ji bo wê beriya ez dest bi axaftina xwe bikim: Tevahî jinên yên ku şehîd ketin, tekoşîn kirin û di rêya azadiyê canê xwe ji dest dan em deyndanrê wan in, ji ber ku wan bi xwîna xwe, alanên û keliyên azadiyê ji bo me avakirin. Ez di şexsê sembolêm me yên şoreşa jin heval Zilan, heval Azime, heval Şervîn, heval Zeyneb, heval Arîn, heval Sakîne Canzis, heval Viyan, heval Destina, heval Zehra, heval Gulan hemû Şehîdên ku ji bo şoreşa jin Şehîd ketin em wan bîr tînin. Û ez jinên enternasyonalîst ên ku beşdarî vê şoreşê bûne û şehîd ketin bi bîr tînim û bejna xwe li hember wan ditewînim.

Cîhana me îro di aloziyek mezin de ye, ji ber zihniyeta desthilatdar, nîjadperestî, olperestî û baviksalarî ya ku mêr pêş xistiye, cîhana me ya îro bi xetereyên pir mezin re rû bi rû maye. Û îro em bi şerê cîhanê yê sêyem re rû bi rû ne, ku bê guman ne li Rûsya û Ukrayna, lê li herêma me dest pê kir. Dema ku em îro behsa bi milyonan mirovên penaber dikin, em behsa bi mîlyonan jinên ku pêrîşan bûne dikin, em behsa bi mîlyonan zarokan dikin ku bê cîh û war man. Ev encama şerê cîhanê yê sêyemîn e ku li Rojhilata Navîn dest pê kir û îro ev şer li hemû cîhanê belav dibe. Şerê ku li Ukraynayê pêş dikeve, berdewamiya şerê zilamê desthilatdar e ku ji şer têr nabe û mîna xeteriyek li cîhanê belav dibe. Di roja me ya îro de sîstema desthilatdar ya moderniteya kapîtalîst ya ku xwe ser  çanda desthilatdarî, çanda destdrêjî, çanda ku gelan û jin di qirkirinê de derbas dike şerekî dijwar dimeşîne. Her yek dixwaze xwe di ser cihanê serwer bike. Ev şerê ku îro li Ûkraina tê kirin, ne şerê gelan e. Şerê ku li Ûkraîna tê kirin, şerê ku li Rojhilata Navîn tê kirin, şerê ku di herema me pêşdikeve ne şerê me ye, ji ber ku ew nakeve bin xizmeta gelan, bindestan an jinan. Berovajî vê, ev şer ji aliyê modernîteya kapîtalîst ve, ji aliyê hêzên hegemonîk ve, li dijî jinê, li dijî mirovan, li dijî zarokan, li dijî xwezayê, li dijî aboriyê tê meşandin. Hemû nirxên mirovahî xistiyê ber xwe û pêlê dike, diperçiqîne, tûne dike. Ji ber wê jî em dibînin ku roj bi roj nexweşiyên gelek giran derdikevin. Ev sîstem ne tenê bi sîlah hemberî me şer dike, ev sîstem herwiha bi nexweşiyan bi mere şer dike, şerê biolojîk pêşdixîne, xizanî pêşdixîne bi şerê aborî, felaketa çêdike, di encama xerakirina xweza de cîhan îro dişewite. Navenda modernîteya kapîtalist jî agir pêketiye. Ev çend roj in em dibînin ku London jî dişewite. Ev şerê hovane û bê kontrol, zilm, koletî û tundiyê gurtir dike. Lê îro ev agir îro berpirsên agirê jî dişewitîne, ew jî nikare xwe ji vî agirî biparêze, ji ber ev agir bê kontol e.

Ji ber vê yekê em dikarin bêjin ku sîstema desthilatdar niha ji her alî ve ber bi hilweşînê ve diçe û di nava aloziyê de ye, ji ber ku li şûna ku çareseriyan çêbike, pirsgirêkan gurtir dike, li şûna azadiyê, koletiyê xurt dike, li şûna ku ewlehiyê bîne, şer gurtir dike. Hûn dibînin, îro ew welatên ku zêde girîngî nedane çekan û sîstema parastin, neçar man ku dest bi vê yekê bikin. Îro ger cîhan

hemû ber bi çekan ve dibeze, ev encama xeteriya ku ev sîstem li ser mirovahîyê çêdike. Ji ber ku kes xwe di aramiyê nahise hundirê vê sistemê de, herkes di xeteriyê di metirsiyê de ye. Wê çi bibe? Wê li kîjan welatî çi biteqe? Di 5 mehên dawî de zêdetirî 3 milyon kes ji Ukraynayê koçber bûne. Di van 10 salên dawî de bi milyonan mirov ji Sûriyê koçber bûne û bi sed hezaran jî hatine kuştin. Îro jî em dikarin bibêjin ku Sûriye bûye girtîgeheke ku gelê heremê bi bombebaran, birçîbûn û şerê hovane tên terbiye kirin.

Di van salan de ev sîstemê gelek welatên Rojhilata Navîn xistiye nava aloziyek mezin. Îro herêm bi êrîşeke mezin re rû bi rû ye. Lîbya hatiye hilweşandin, Libnan ber bi perçebûnê ve diçe, 9 meh berê li Iraqê hilbijartin pêk hatin û heta niha jî nikarîbûn hikûmetek ava bikin.
Îran jî di bin oqûbetên mezin de ne û ji ber sîstema nedemokratîk a hundir jî bi kaoseke mezin re rû bi rû ye. Tirkiye bi rêya faşîzma rojane dixwaze netewe dewletê biparêze û rojane faşîzma netew dewlet divereşe. Duh we hemûyan dît ku li Duhokê komkujiyek li dijî zarok û jinan tê kirin. Dewleta Tirk hewl dide pirsgirêkên xwe bi şer çareser bike. Efxanistan jî encama sîstemeke wiha ye. Piştî ku DYA ji Afganîstanê derket, we dît ku çewa dayikan zarokên xwe avêtin hemêza leşkeran. Ev rûyê wan ê rast e, ew tabloya duh li Duhokê, tabloyê zarokê ku dayka wî, wî avêtiye ji bo wî xilas bike.

Li Efrîn, Serêkaniyê û Girê Spî her roj êrîşên li dijî herêmên dagirkirî tên kirin. Destdrêjiyên ku rojane ser jinan tê kirin, bûyerên hovane yên ku her roj em li çar aliyê cîhanê rû bi rû dimînin, rastiya vê pergala zordest a mêran temsîl dike. Ji ber wê pêwîstiya cîhanê bi nûbûnê heye. Pêwîstî bi şoreşekê heye. Pêwîstî bi paradîgmayeke nû heye. Pêwîstî bi sîstemeke nû heye. Pêwîstî bi zîhniyeteke nû û siyaseteke nû heye. Ji ber vê yekê em dibêjin şoreşa Rojava, Kurdistanê, şoreşa jinê ji bo hemû gelên herêmê û hemû cîhanê pir girîng e.

Em îro bi perspektîfa jina azad, şoreşa jinê, bi perspektîfa neteweya demokratîk, jiyana hevpar a gelan, ji cîhanê re dibêjin: Li gel pergala kapîtalîst, baviksalarî û vê tarîtiyê rêyek din heye, jiyanek din heye û hûn heq dikin ji bo vê jiyana din. Alternatîvek heye. Ji ber vê sedemê dema ku hemû cîhan li vir dinêre û dibêje hêvî li vê erdingariyê biçûk heye, ev nayê wê wateyê ku hejmara me pir zêde ye, lê perspektîf û armanca vê şoreşê pir mezin e, bi nirx e, pir balkêş e û ji bo mirovahiyê, ji bo van nexweşiyan, tarîtiyê wekî ronahî û dermanek e.

Bi rastî jî ev zîhniyeta desthilatariya mêr ya ku înflas dibe û aloziyê kûr dike. Li şûna wê zîhniyeteke nû pêwîst e. Me bi şoreşa jinê, di serî de şoreşa jinên Kurd, jinên Mezopotamya, jinên Bakur û Rojhilatê Sûriyê biryara ku em ê vê cîhanê biguherînin dane. Û em ê cîhanek nû ava bikin. Şoreşa jinê, şoreşa li dijî zayendperestiyê, li dijî olparêziyê, li dijî nîjadperestiyê, li dijî zexta zanista pozîtîvîst, li dijî van hemûyan, perspektîfeke nû ya azadiyê afirandiye.

Ev perspektîfa ku nasnameya wê ya rewşenbîrî Jineolojî ye, hişt ku hêza me ya têkoşînê mezin bibe û em bi vê hêzê cîhanê bihejînin. Bi rastî her kes ji vê sîstemê nerazî ye, lê çareya wan nîne. Lê têkoşîna me çareseriya aloziyê ku mirovahî tê re derbas dibe ye. Bi vê boneyê di 10. salvegera Şoreşa Jinê de em rêhevalê xwe Abdullah Ocalan silav dikin. Yek ji sedemên sereke ku 23 sal in di girtîgehê de ye û her cure îşkenceyên nemirovane dîtiye, di odeyekê de hatiye tecrîdkirin ev e ku diyariya fikra îdeolojiya azadiya jinê, Jineolojî û fikra şoreşa jinê ye ku daye me ye. Em hevaltiya

Abdullah Ocalan ku hevaltiya raste silav dikin. Û em dibêjin çewa te bi jinan hevaltiya rast kir, te bi hevaltiya xwe ya zarokatî bi jinan re ti carî xiyanet nekiriye û heta îro li dijî her cure tundiyê li ber xwe daye, em jî rêhevaltiyek rast bi tere bikin.

Ger em dilsozê vê hevaltiyê nebin, em bi şoreşa xwe bikevin nakokiyê û xiyanetê lê bikin. Ji ber vê yekê em weke jinên vê herêmê îro gelekî kêfxweş in. Û çima? Em îro dîrokê dinivîsînin. Dîroka me ya piştî serdema xwedawendan heta îro, dîroka şîdet, koletî, zilmê, desthilatdarî û destdrêjî ye bi tiştên herî xerab ên ku ji bo me guncav dîtine tijî ye. 10 sal in me rûpeleke nû ya zêrîn ji bo xwe re nivîsand. Hûn hemû gelek bi şans in, ji ber ku hûn bûne rûpelek di vê dîrokê de, bi keda xwe we di vê rêya azadiyê de gav avêtin. Di her qonaxên şoreşê de jinan ji bo vê şoreşê fedekarî kirine û şopa xwe hîştin. Ev ji bo me şahnaziyek mezin e, ku îro em bi îradeya xwe, bi zimanê xwe û bi hişê xwe, bi hest û aqlê xwe dikarin pêşeroja xwe diyar bikin.

Em nîqaş dikin, em azad difikirin, em bi zîhniyeta azadiyê difikirin. Di dawiyê de em bi xwe bawer dikin. Hûn nikarin wê li cîhekî din ê cîhanê bibînin. Asta ku şoreşa jinê li Rojava û Bakur û Rojhilatê Sûriyê pêşxistiye, îro li tu deverên cîhanê nîne.

Lewma divê em qîmeta wê baş bizanibin, ji ber ku êrîşên pir mezin li dijî me hene. Ev hêzên xwînmij ên ku zarok, jin, mirov û xwezayê qetil dikin, ji destkeftiyên me yên jinan ne kêfxweş in. Çawa ku me weke jin di şoreşê de, di parastinê de, di perwerdeyê de, di siyasetê de, di xebatên civakî de, di edaletê de, di hemû qadên jiyanê de pêşengtî kiriye. Niha divê em şoreşa xwe bikin şoreşeke civakî, ji bo ku em rê ber hemû paşverutiya kevneşopiya bigirin, ji bo ku em karibin hemû gefên li ser hebûna xwe ji holê rakin.

Di 10 salên şoreşê de divê em stratejiya parastina şoreşa jinê, şerê şoreşgerî yê jinê bikin armanca xwe. Divê em ji xwe re nebêjin ku her tişt baş e. Ji ber ku ev dijminê ku cenazeyê şehîd Barîn parçe kir, dixwazin me bifetisînin. Ev dijmin hê jî dixwaze me hemûyan parçe bike. Divê em xwe nexapînin. Ji bo vê jî divê hemû jinên azadîxwaz bi çek bin. Ger em xwe nekin çeka azadiyê wê me bikin çek û li dijî me bikar bînin. Îro li hemû cîhanê jin kirine çek û li dijî jinan bikar tînin.
Di rêya şerê taybet, reklam, destavêtin, êrîş û her cure hovane yên ku hene jin kirine alet ji bo qezençê. Ji bo ku pere qezenc bikin çavên jinan, zimanê jinan, hemû beşên jinan kirine çekek ku li hemberî wê bikar tînin.

Ji bo vê jî divê em her roj hişmediya xwe bi azadiyê av bidin her roj hestên xwe bi azadiyê ava bidin. Divê em her roj li ser esasê parastina azadiyê bedena xwe perwerde bikin. Bê parastin azadî nabe; bê parastin, şoreş mayinde nabe. Ji ber vê yekê divê her jin xwedî li azadiya xwe û şoreşa xwe derkeve. Divê em her roj jinên Efrînê, her roj jinên Serêkaniyê, Girê Spî, jinên Afganîstanê ber çavên me bin. We dît ku wan çi anîne serê wan, di sala dawî de her roj felaket anîn serê jinên Afgan, her roj tiştekî nû heram kirin. Her roj wan dixin zincîran. Belkî ger mîna Rojava şoreşa jinê û ew heza xwe biparasta û mezin kiriban îro ne di vê rewşê de bûna.

Ez dawiyê de dixwazim wiha bêjim: Em şoreşa jinê, şoreşa gelan, Şoreşa 19'ê Tîrmehê pîroz dikin. Di van 10 salan de me serkeftinên mezin bi dest xistin. Di hemû saziyên şoreşê de jinan %50 cih girtine. Jinan pergala hevserokatiyê pêş xist. Û ji bo xurtkirina wê roj bi roj tekoşîn dike. Jinan

ji sedî 70 xebatên perwerdeyê girtine ser milê xwe û rola pêşeng lîstine. Jinan di nava hêzên xweparastinê de berxwedaniya herî xurt nîşan dan û lehengiyeke mezin nîşan dan. Jinan di van 10 salan de hevpeymana civakî ya gelan û qanûnên jinan pêş xistin. Di hemû qadên weke spor, çand, perwerdehiyê de jinan di van 10 salên dawî de serhildana jiyan kirin. Tiştê ku me di 100 salan de bi dest nexist, me di hundirê 10 salan de bi dest xist. Lê ev nayê wê wateyê ku şoreş bi dawî bûye. Şoreş ji qonaxa zaroktiya xwe derdikeve û dikeve ciwaniya xwe. Divê em bi vî ruhî tevbigerin.

Divê em bêtecrubeyê li pey xwe bihêlin û bi awayekî jêhatî û hostayî têbikoşin. Divê em şoreşê ji asta takekesê derxînin û bikin şoreşa hemû civakê û hemû jinan.
Hêz û îradeya me heye, divê em tenê bi xwe û hêza xwe bawer bin. Me di vê şoreşê de gelek caran îspat kiriye ku tistek nikarê hemberî îradeya me bisekne. Ji ber vê em dibêjin: Bi hêz û îradeya jinê em ê sedsala 21'an bikin sedsala azadî û wekheviyê.

Û em ê rê li ber hemû mirovahiyê bidin cîhanek ekolojîk, cîhanek bi demokrasiyê, cîhanek ku jinên azad û zilamên azad bi serbestî bijîn. Em cîhanek wiha ava bikin. Bi vê wesîleyê em hemû jinên kedkar ên îro li vir in, hemû jinên di vê şoreşê de li ber xwe dane, hemû jinên di vê şoreşê de têkoşiyane, hemû jinên Kurd, Ereb, Asûrî û lehengên me yên qehreman ên YPJ'ê silav dikin. hêzên parastina jin, em careke din wan silav dikin, wan pîroz dikin. Û em dibêjin sedsala 21. wê bibe sedsala jinan. Wê bibe sedsala azadiya gelan.

## Rewşa Jinên Sûriyê Beriya Şoreşa Jin

Hêvî Mustafa – Hevserokê Kantona Efrîn ya berê

Ji destpêka dîroka mirovatiyê heta îro, jin di nav civak û şaristaniyan de yek ji rola herî bibandor a mirovî girtiye ser xwe û di jiyan û pêşketina civakê de cih digire. Ew beşek girîng in ji bo parastina berdewamiya mirovahiyê, û parastina wê ji windabûnê.

Gelek jinan mohra xwe li dîroka Sûriyê hiştine, weke "Mauya, Sultana herî mezin a Sûriyeyê", "Zenobiya ya rêveber", "Kleopatra" heta jinên Sûriyê yên îro. Ev yek bi taybetî li gorî trajediya kirîza Sûriyê rastiyek e, tevî ku tê wê wateyê ku azadiya wan bi têra xwe tune ye ku helwestên xwe der barê mijarên siyasî, olî û civakî de bînin ziman.

Gelek cureyên qedexeyan hene ku tevgerên jinan felç kirine û şeklên van qedexeyan li gorî dem û mekan hatine guhertin. Tevî vê yekê jî serhildana wan bênavber bû û jinan ji bo şikandina van zincîran berdewam kirin û biryar dan ku bibin pêşengên îlhamê, ne ku bibin qurban. Îro em dikarin bi dilgermî bibêjin ku di şoreşên gelêrî yên li dijî rejîmên dîktator de rola herî sereke ya jinan e.

Di dirêjahiya dîroka Sûriyê de, tekoşîna jin ku roleke sereke di bidawîkirina dagirkeriya Osmaniyan de hebû û piştre jî roleke çalak di berxwedana li dijî mêtîngeriya Fransî de hebû. Ev tevger di nav salonên edebî de hat birêxistinkirin. Nimûne jinên yên wek Meryem el-Ecmî (Şam); Nazik Zehra el-Ebed xanim; û Nebbaha keça Îbrahîm Hanano ku alîkariya şoreşgeran kir û di şerê Qesra El-Esmê de şehîd bûn. Kesayetên jin jî hebûn ku beşdarî siyasetê bûn: Kesên wek Soraya el-Hafez, ku roleke mezin di bidestxistina mafê dengdanê û hilbijartinê de ji bo jinan re lîst.
Lê ev tevgera jinan di serdema derbeyên leşkerî yên ku Sûriye bi salan di nav de derbas bû, kêm bû û qels bû. Di dema yekîtiyê de di sala 1958 de, Meclisa Netewî ya ji 2000 endaman pêk dihat hate damezrandin, ku tê de tenê du jin Cîhan el-Mûsilî û Wedad Ezherî çîh digirtin. Piştî ku di sala 1963'an de Partiya Baas hat ser hikimê, tevgera girseyî hatin kontrolkirin û saziyên civaka sivîl û komeleyên bi mafên jinan re jî di nav de, hatin hilweşandin. Medya ya rejîma Sûriyê dest pê kir ku jinan weke koleyên bindest nîşan bide û wek ku tenê xema mêrê xwe re alaqadar dibe û fermanên wî bicîh tîne. Rejîmê xwe weke ku ji bo rizgarkirina jinan ji wê bêedaletiyê nîşan da.

Divê em rola jinan di pozîsyonên biryardanê de nas bikin. Di sala 1949'an de mafê dengdanê jinan û di sala 1953'an de mafê ku jin xwe bidin dengdanê hat dayîn, lê heta sala 1960'an ti jin negihîşt meclîsê. Di wê salê de cara yekêm de 2 jinan ji 200 sed kursiyên parlamentoyê 2 kursî bi dest xistin. Piştî 8'ê Adara 1963'an ji 95 kursiyan 8 kursî ji jinan re hatin dayîn. Bi tevahî em dibînin ku ji dema damezrandina Parlamentoya Sûriyê û vir ve rêjeya kursiyên jinan di dema dawî ya kar de ji %8,2 rabû %11.

Yekemîn wezîra jin di hikûmeta Sûriyê de Necah El-Ettar di salên 1975-1976an de hat tayînkirin. Di sala 2000 de du wezîr Necwa Kassab Hesen û Ghada el-Cabî nikaribûn erkê xwe bikin, ji ber li gorî destûra bingehîn ya Sûriyê ku diyar dike ku serokê dewletê divê misilmanek zilam a sûrî be. Jin ji sala 1952'an û vir ve di qada adaletê de wekî parêzer dixebitin. Rêjeya jinan di qada adaletê

de %14 e bû û ev rêje hebû ji ber destûrê de di hemû meclîsan e hewce bû. Ango: Xala 45 a Destûra Daîmî ya Sûriyê dibêje: “Dewlet dê hemû derfetên ku rê bidin jinan ku bi bandor û tam beşdariyê di jiyana siyasî û civakî de bibin û astengiyên ku rê li ber pêşketin û beşdarbûna wan di civaka Erebî ya Sosyalîst de digirin, rake”. Lê ew ne garantiya wekheviya tam e, an beşdariyek bi bandor e. Ji kesî re ne veşartî ye ku beşdariya jinan di warê aborî û civakî de lawaz e û ji ber urf û edetan ji mal û milkê bêpar mane. Li aliyên gunda, tevî rola wan a aktîf di parastina ax û nirxan de, %82 ji zeviyên çandiniyê yên mêran û tenê %2.10 jî yên jinan e.

Di perwerdeyê de beşdarbûna jinan baş bû, di asta seretayî de %64 û di qonaxên bilind de jî %50 e. Rêjeya momsteyên jin di zanîngehan de nêzîkî %20 e, lê ev rêje û beşdarbûn lewaz hîna hişyarî dernexistiye holê û mesaj li ser prensîbên edalet û wekheviya zayendî nedaye. Bernameyên perwerdehiyê heta vê dawiyê hînkirina naverokan ku cudahiyên zayendî pêş dixin berdewam kirin. Pergala perwerdehiyê ji bo jinê nekariye kesayetek nû û helwestên nû ava bike.
Ka em hinekî ronahiyê bidin aliyê qanûnî. Xala 44 a Destûra Bingehîn: “Dewlet zewacê diparêze û teşwîq dike, ji bo rakirina astengiyên madî û civakî dixebite, dayiktî û zaroktiyê diparêze û şert û mercên guncaw ji wan re peyda dike”. Lê gelek qanûn hene ku berovajî xalên destûrê ne wek newekheviya zayendî di berdana keyfî de, pirjinî, dilrehetiya di kuştinên namûsê de, kêm nirxa şahidiya jinan di dadgehê de, yasaya netewbûnê, yasaya binçavkirinê, serwerî û mîrasê de û şahidiya du jinan diyare ku di qanûna Sûriyê sîstemeke dualî heye ku dadgehên sekuler û olî dihewîne, û yasaya rewşa kesane bi rêya dadgehên Şerîetê tê sepandin.

Tevî ku Sûriyê gelek peyman îmze kirine, di nav wan de Peymana CEDAW ya li ser Rakirina Cûdahiya Neyînî di navbera jin û mêran de, lê wê gelek bendên vê peymanê neparastiye, di nav de parastina qanûna niştimanî, ya ku destûr û berjewendiyan dide bavan lê ji dayikan re ew neyên dayîn. Wek mînak: Jineke sûrî ku bi mêrekî ne-sûriyeyî re zewicî ye, zarokên xwe sûrî nahesibîne tevî ku ew li ser axa Sûriyê ji dayik bûne û li wir niştecih bûne, lê zarokên ku ji bavek sûrî ku bi jineke biyanî re zewicîn jî wek sûrî têne hesibandin ger ew li derveyî xaka Sûriyê ji dayik bûne jî. Gelek mînak hene, lê ji ber kêmbûna demê nayên gotin û şîrove kirin.
Jinên Kurd di bin dewleta Sûriyê Jinên Kurd ji aliyê mêr û civakê ve û di heman demê de ji aliyê netew-dewletê ve bi hemû şêweyên wê yên netewî, civakî-aborî û hiqûqî rastî çewisandinan hatine. Jinên Kurd du caran dibin qurban, carek mexdûrê civaka baviksalarî bi urf û adetên wê, carek jî qurbaniyên bindestiya netewî de.

Destûra bingehîn ku dibêje gelê Sûriyê beşeke ji neteweya Ereb e, zordestiya niştimanî kûr dike, jinên Kurd û hemû jinên kêmnetew ji nasnameya xwe ya netewî bêpar dike û li gel vê yekê jî nasnameya wan a jin bêpar dike. Herwiha zêdetir ji 250000 welatiyên Kurd ji hemwelatîbûna Sûriyê û mafê hemwelatîbûnê bêpar bûn û jin jî di nav de. Ev yek ji holê rakirin û tinekirina nasnameya etnîkî nîşan dide. Rewşa Awarte ji sala 1963’an ve bi taybetî li herêmên Kurdan hatiye sepandin û ev yek bi giştî xebatên siyasî û beşdarbriya jinan di qada siyasî felc dike.
Hikûmeta Sûriyê jî bi qedexekirina zimanê zikmakî yê welatiyên din, û bi fermîkirina zimanê erebî, siyaseta erebkirinê û hewlana tunekirina çandî da destpêkirin. Xala 21’ê mîn a Destûra Bingehîn wiha dibêje: “Sîstema perwerde û çandê armanc dike ku nifşek erebî ya neteweyî, sosyalîst, zanistî bi axa xwe ve girêdayî û bi mîrateya xwe serbilind be, bi ruhê têkoşînê ji bo bidestxistina

armancên miletê xwe di yekîtî, azadî û sosyalîzmê de biafirîne.” Ev jî delîlên zelal ên siyaseta erebkirin û înkarkirina neteweyên din e. Ev jî berovajî Peymana Mafên Zarokan a Neteweyên Yekbûyî ye ku Sûriye jî îmzekarê wê ye, ku dibêje: “Mafê her zarokî heye ku bi zimanê xwe yê zikmakî fêr bibe”. Ev polîtîka ji bo rakirina nasnameya kurd û derxistina jinên kurd ji cihên biryardayînê yên di nava partiyên kurdî de bû.

Herwiha bi dehan û heta bi sedan jin hatine girtin û çarenûsa hinek ji wan hîna ne diyar e, wek ya Nazli Kajal. Yekem car di dîroka Sûriyê de ku jin di dozên siyasî de hatin darizandin du jinên kurd ên Efrînê bûn. Bi vî rengî nifşek keç bi çîrok û lehengiya têkoşerên weke şehîd Sakîne, Sara û Zîlan mezin bûn û gelekan navên wan li xwe kirin. Ev keç bi desteka madî û manewî ya dayik û malbatên xwe hê zêdetir mezin bûn û dest bi rêxistinbûnê kirin.

Tê bîra min ku çawa hêzên ewlehiyê di 21’ê Adarê de, roja cejna Newrozê, avêtin ser malên keçên kurd ên xwendekar û tenê ji ber ku ew ne li dibistanê bûn, ew girtin. Tê bîra min ku dayikan ji keçên xwe re got: “Herin û serbilind bin ku dewriyeya ewlekariya siyasî hûn girtin, tu hinceteke wan a exlaqî tune.” Rêjeya keçên xwendevan zêde bû, û yek bi yek ji zanîngehên Sûriyê qedandin û hêjabûna xwe di hemû waran de îsbat kirin.

Nirxandina 10 salên şoreşa jinê

Asya Abdullah - Hevserokê Partiya Yekitiya Demokrat PYD

Di serî de em 10’emîn salvegera şoreşa 19’ê Tîrmehê li hemû jinên Sûriyê, hemû rêxistin û kesayetên ku di van 10 salan de bi şoreşê re bûn û piştgirî dan şoreşê, li ber xwe dan û hewl dan, da ku em îro van rojan bijîn pîroz dikin. Em wan hemûyan silav dikin. Em hemû şehîdên têkoşîna azadiyê silav dikin. Ji bo em van rojan bijîn û şoreşa xwe ragihînin, bibin hêz û parastinê ava bikin û xwe bi rêxistin bikin, ew şehîd ketin. Em hemû şehîdan bi bîr tînin û bejna xwe li hember wan ditewînin.

Darxistina Foruma Şoreşa Jinê, em weke erkeke stratejîk a hemû jinan dibînin. Ji ber ku şoreşa me xwe dispêre nirx û têkoşîna sed salan ku jin ji bo azadiyê xwe feda kiriye. Ev nirxên ku jin û rêxistinên jinan di dîrokê de afirandine, îro şoreşa me xwedîderketina wan e û mîrateya wê ye. Ji bo parastina van nirxan serkeftina şoreşa me ya îro serkeftina hemû jinan e.

Di van 10 salên şoreşê de me çawa xwe rêxistin kir? Me çawa dest pê kir? Me çawa biryara şoreşê da? Me stratejiya şoreşê çawa  destnîşan kir? Ev hemû ji bo hemû jinan biryarên stratejîk bûn.  Ji sala 2012’an û vir ve hemû rêxistinên jinan çalak bûn xebat û ked dane meşandin. Bi rengên cuda û rêxistinên jinan ên xweser ên weke Yekitiya Star (Niha Kongra Star) û xebatên jinan ên di nava partiyên siyasî de helwestek, berxwedanek, lê şert û mercên gelekî dijwar hebûn. Em hîn bi qasî ku diviyabû bi rêxistin nebûn. Lê weke jinên Rojava me di destpêka şoreşê de karîbû biryarên stratejîk bigrin. Ji ber vê yekê divê em li dijî hemû polîtîka û zîhniyetên ku sed sal in li ser jinê tê meşandin, xwedî biryar û stratejîk tevbigerin. Ger em li dijî van polîtîka, rêgez û zagonên ku bi destên mêran li dijî jinê û têkoşîna azadiya jinê hatine nivîsandin û bi destên pergalê hatin pêk anîn têkoşin nekin, li dijî van rêgezan xwe birêxistin nekin, şer nekin li dijî wan, wê demê em nikarin bibin alternatîf û şoreşê bikin.

Di sala 2012’an de ji xwe mîrasek me ya dewlemend hebû û şoreşa me jî li ser mîrasa jinên şoreşger ava bû. Di dawiya salên 80’î de û bi taybetî jî di salên 90’î de li Rojava pêleke mezin a jinên şoreşger pêş ket. Di şexsê Dîcle Kobaniyê de Şîlan Kobanî, di kesayeta Zeyneb, Şervîn, Dîlan û Rêhanê de û bi sedan jinên şoreşger di rojên herî dijwar de biryar dan ku di rêya azadiyê de bimeşin. Û çûn qadên têkoşîna azadiyê, ji bo parastina jin û nirxên netewî yên Kurd û gelan têkoşiyan û dest bi şoreşê kirin. Ji ber vê sedemê jî em dikarin bibêjin ku di vê qonaxê de ev bi sedan jinên pêşeng ji bo me bûn şansek ku em bibin rêxistin, têkoşîn, îrade, nasname û li hember wan dengên ku dibêjin jin nikare şoreşê bike, nikaribin xwe biparêzin, siyasetê bikin, rêxistinekê ava bikin. Tekoşîna jinan li hemberî van nêrînan berxwedanek mezin kirine. Vê yekê bandorek mezin li ser civakê kir, bandorek mezin li ser malbatan kir. Ji bo me îmkan û derfet çêbû ku em rêxistina jinan pêş bixin û salên dirêj xebat hatin meşandin. Ev bû bingehek ku di sala 2012’an de li ser tevgera jinê gelek nirxandin hatin kirin û gelek platform hatin afirandin. Yekitiya Star di sala 2013’an de kongreya xwe li dar xist. Li ser wê yekê nîqaş hatin kirin ku em çawa dikarin şoreşê bikin? Em ê çawa xwe amade bikin? Û em ê çawa bi hev re du şoreşan bikin? Şoreşa jinê û şoreşa gelên demokratîk. Li ser vê bingehê biryarên stratejîk hatin girtin. Yek ji biryarên stratejîk jî ew bû ku ger parastina jin nebe , em nikarin şoreşê bikin û rêxistin bikin. Ji bo vê jî bi pêşengiya bi sedan jinên ciwan hêzên parastinê yên şoreşê hatin pêşxistin. Bi îmkanên pir hindik, lê îradeyek xurt. Ji bo pêkanîna şoreşê gund bi gund, tax bi tax amadekarî hatin kirin.

Di van amadekariyan de xebatên stratejîk hene: 1. xweparastin 2. rêxistinkirina jinên xwedî nasnameya xweser. Ger em bi nasnameya xweser xwe bi rêxistin nekin, em nikarin li vî welatî sîstemeke demokratîk ava bikin. Ger em xwe bi rêxistin nekin, em guhertin çênekin em nikarin mafên jin misoger bikin. Bêyî avakirina sîstemeke bi nasnameya jinê ya li dijî zilma li ser zilam, ev yek ne pêkan e. Li hemberî van sînorên ku ji bo jiyana jinan hatin zelalkirin têkoşîneke xurt hate meşandin. Belkî di destpêka şoreşê de gelekan digotin “divê jin çawa şoreşê bike?

Gelek kes gotin ku divê pêşî şoreş bi dawî bibe, piştre jin li ser pirsgirêkên xwe biaxivin. Ev jî argumaneke ku demeke dirêj li dijî têkoşîn û rêxistinbûna jinê dihat meşandin. Lê di vê serdemê de biryar hate girtin ku şoreşa jinê û şoreşa civakî bi hev re bên meşandin. Şoreşa jinê û şoreşa demokrasiyê wê bi hev re pêk werin. Şoreşa jinê û şoreşa neteweyî wê bi hev re pêk were.

Ger şoreşa jinê pêş nekeve, ne şoreşa demokratîk û ne jî neteweyek pêş dikeve. Ger şoreşa jinê pêş nekeve, di civakê de guhertin çênabe, di jiyanê de jî guhertin çênabe. Ev raman, ev zîhniyetên ku bi sedsalan li dijî vîna jinê xebitîne, dixwaze xwe zindî be. Şoreşa jinê şoreşa zihniyetê ye.

Şoreşa ku li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê hat kirin, şoreşeke zîhniyetê derxist pêş. Li hemberî hemû zîhniyetên mêtingerî, navendîparêzî, şoreşa zihniyetên demokratîk hate afirandin. Şoreşa jinê esas e û bûye bingeha şoreşa Bakur û Rojhilatê Sûriyê. Şoreşa jinê bû bingeha projeya Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê. Bi vê nasnameyê jinan li Bakur û Rojhilatê Sûriyê xwe bi rêxistin kirin. Yek ji stûnên bingehîn ên şoreşa jinê, tifaqên jinan bû, ev xebateke stratejîk bû, xebateke hevpar a hemû jinan û rêxistinan bû, hêza jinê kirin yek û bi vê yekê me serkeftinek mezin bi dest xist.

Bi xebat û hevgirtinên jinan ên li Bakur û Rojhilatê Sûriyê em gihiştin astekê ku em li cîhanê bibin mînak. Xebatên parastinê, avakirina sîstemeke demokratîk a di civakê de, ev jî karên bingehîn bûn. Herî dawî rê li ber jinan vebû ku karibin derbasî hemû qadên têkoşînê bibe û derbasî qada azadiyê bibe. Herî dawî jin ji malên xwe derketin. Diwarên ku li pêşiya jinan sekinîn herî dawî bi Şoreşa Jinê re hatin rakirin û qadên azadiyê hatin avakirin û hemû jin bi rengê xwe, bi nasnameya xwe, bi ramana xwe, bi vîna xwe dikarin beşdarî hemû qadên şoreşê bibin û pêşengiya şoreşê bikin. Ev mozaîka îro li vir îfadeya wê ye. Ger em îro li asta Sûriyê binêrin, ku zêdetirî 50 rêxistinên jinan, nasnameyên netewî, nasnameyên çandî û baweriyan em îro li vê salone bi hev re ne, me şoreşek pêk anî. Îro em bi hev re şoreşa 10 salan dinirxînin û pêşeroja xwe bi hev re destnîşan dikin.

Ev jî ji bo hemû jinên Sûriyê, herêmê û hemû jinan serkeftineke mezin e. Bi rastî jin di şoreşê de berdêlên mezin dane. Ên di hemû qadên jiyanê û berxwedanê de bi fedekarî ked dane, jin bûn, dayik bûn, endamên YPJ'ê bûn û niha bi hezaran birîndarin ku li eniyên berxwedanê li ber xwe dane û parçeyên bedena xwe feda kirine hene.

Berxwedana ku li herêma me hat afirandin ji bo cîhanê mînakek e. Çawa hate afirandin? Li ser çi bingehî çêbû? Li ser kîjan ramanê ava bû? Li hemberî hemû êrîşan hêz û îradeya xwe çawa pêş ket û bi ser ket? Şoreşa me li ser fikir û felsefeya jiyana azad, jina azad, nasnameya jina azad ava bûye. Şoreşa me bi rengê jinê, bi ramana jinê, bi raman û hêza jinê, bi nasnameya jinê hate pêşxistin. Îro li kuderê ev pêk bên, jin lê hene, li cihê ku ev nebin, rewşa jinan pir xetere. Tiştekî mîna Şengalê dîsa dibe.

Tişta ku îro li herêmên dagirkirî li dijî jinan diqewime wê dubare bibe. Li Efrîn, Serêkaniyê, Girê Spî, Îdlîb, Cerablûs, El Bab, Ezazê îro qirkirina jinan tê kirin. Ji ber ku dagirkeriyeke weke îro û di dîrokê de her ku pêk hatiye, bi tinekirina jinan, bi qirkirina jinê hatiye kirin. Li dijî van êrîşên ku li herêmên dagirkirî li dijî jinan tên kirin, divê em têkoşîna xwe xurt bikin. Divê em asta berxwedana xwe bilind bikin. Armanca me ew e ku em van hemû jinan ji dagirkeriyê, ji komên çete rizgar bikin. Armanca me, biryara me û têkoşîna me wê ji bo jinan bibe bersiv. Ji ber vê yekê em ê bibin bersiva hewldan û berxwedana dayîk û şehîdan. Li pêşiya me têkoşînek dirêj heye. Belkî di van 10 salan de me şoreşeke ku gihiştiye astekê kiriye, em bûne nasname, bûne ê xwe, îro em jin ê xwe ne. Bi hêz, raman û îradeya xwe em li ser piyane. Ev fikir, hêz, vîn û felsefeya ku Abdullah Ocalan di van 40 salên dawî de ji bo tevahî têkoşîna azadiya jinê, ji bo parastina jinê û rêxistinbûna jinê daye pêş, ev ji bo hemû jinan îro hêzeke mezin e. Li ser esasê vê felsefeyê em dikarin bi reng û nasnameya xwe xwe bi rêxistin bikin. Em dikarin têkoşîna azadiyê bilind bikin.

Jinên ku ne xwedî stratejiyek bin, ne parastin, ne sîstemek li gorî îdeolojiya azad ava kirine, li cîhanê qirkirina jin a mezin heye. Ji bo pêşîgirtina li van komkujiyan, ji bo pêşîgirtina li êrîşan, divê em tiştên ku heta niha bi dest xistine, ji bo şoreşa me bûye bingeh xurtir û zêde bikin. Em weke rêxistin û tevgera jinan divê hêzên parastinê xurt bikin.

Berpirsiyariya me hemûyan ev e, li hemberî êrîşan em hemû YPJ, HPC ji bo ewlehiya gund, bajar û taxên xwe em hêzên xwe yên parastinê ne. Di siyasetê de em vîna hemû jinan temsîl dikin.

Divê jin di biryarên siyasî de cih bigirin, li ser asta Sûriyê bibin hêzeke xurt, di çareseriya pirsgirêkên li Sûriyê de. Ji bo birêxistinkirina civakê divê em têkoşîna xwe berfireh bikin ji ber ku xeteriyên mezin hene. Divê em qada perwerde û zanînê xurt bikin.

Divê em hemû qadên jiyanê xurt bikin. Dema ku em dibêjin ‘Jin Jiyan Azadî Ye’ tê wê wateyê ku li cihê ku jin lê nebe, xweparastina jinê nebe, jiyan nabe. Cihê ku azadiya jinê tune be jiyan lê tune ye. Ji bo em li her derê jiyanê pêş bixin, divê em li her derê pergala jinê pêş bixin. Em dikarin zanebûna jinê pêş bixin, parastina jinê pêş bixin. Yên ku berê digotin û îro jî dibêjin “Pirsgirêka jinan tenê jinan eleqedar dike û em dikarin çareser bikin” şaş bûn. Pirsgirêka jinê pirsgirêka hemû civakê ye, ya azadiyê ye, ya bingehê civakê ye. Ger azadiya jinê nebe, di civakê de jî azadî nabe.

Ger pirsgirêka jinê çareser nebe, pirsgirêka gelan çareser nabe, pirsgirêka demokrasiyê çareser nabe. Di van têgeha de şoreşa me pêşketiye û em îro li vê derê ne. Li ser van têgehan em dikarin têkoşîna xwe mezintir bikin. Li dijî hemû teoriyên li dijî azadiya jinê, nasnameya wê ya xweser û têkoşîna wê, divê em têkoşîneke hevpar bimeşînin. Heta îro em weke jin xwedî dîrokeke dirêj, têkoşîneke hezar salan e ku ji bo me mîraseke mezin e. Şoreşa jinê ya li Rojava û Bakurê Sûriyê jî ji bo hemû jinan serkeftin û hêzeke mezin e.

Em dikarin bi têkoşîn û tifaqên xwe yên hevpar vê şoreşê biparêzin û bilind bikin, bikin malê hemû jinan. Hemû jinên ku li herêmên dagirkirî dijîn, li dijî dagirkeriyê li zindanan li ber xwe didin, li çiyayên azad li dijî faşîzmê çîrokên lehengiyê dinivîsînin, ê ku bi darê zorê hatine koçberkirin û niha li derveyî gund û bajarên xwe dijîn, em wan hemûyan silav dikin. Têkoşîna me, biryar û berxwedana me wê her tim bi armanca pêkanîna hêvî û daxwazên we û bilindkirina ala berxwedanê li dijî hemû tundiya li ser we tê kirin. Em ji we hemûyan re serkeftinê dixwazin.
Ji destpêka şoreşa Rojava heta niha jinên Kurd di girtîgehên rejîma Baasê de bi hezaran şehîd û bi sedan girtî hejmartin. Rêxistina wan a jinan heye, Kongra Star, ku di sala 2005 de hate damezrandin. Ji roja yekemîn a şoreşa Rojava ve li ser bingehê şoreşgerî û mîraseke xurt di nava têkoşîna şoreşgerî de ne.

Jinan di hemû qadan de wek siyasî, leşkerî û aborî de cihê xwe girt. Ji ber wê jî şoreşa Rojava hate wek şoreşa jinê naz kirin. Carinan ev wisa tê fêm kirin ku jin di şoreşa Rojava de cih girtiye, lê sedem ne ev e. Bi rastî jin di hemû şoreşên cîhanê de beşdar bûn, têkoşiyan û şehîd ketin, lê piştî ku şoreş bi dawî bû, bêhêvî vegeriyan malên xwe û negihîştin armanca xwe.
Tişta ku şoreşa Rojava ji bo jinan cuda ye ew e ku weke jin têdikoşin û beşdar dibin. Artêşa xwe bi rêxistin dikin, zanista xwe ava dikin û di nava şoreşê de mafên xwe bi dest dixin. Ew ê neyên xapandin bi gotinên ku dibêjin bila jin piştî şoreşê doza mafên xwe bikin.

Ji bo vegotina dîroka têkoşîna jinê demek dirêj pêwîst e, lê ji ber kêmbûna demê em ê bi vê razî bibin. Em hêvîdar in ku ev semîner bi beşdariyên din jî dewlemend bibe û ez derfetê didim hevrêya xwe Asya Abdullah ku li ser rewşa jinan a piştî şoreşa Rojava li herêmên Rojava û Bakur û Rojhilatê Sûriyê biaxive.

## Nirxandina 10 salên şoreşa jinê

Asya Abdullah - Hevserokê Partiya Yekitiya Demokrat PYD

Di serî de em 10'emîn salvegera şoreşa 19'ê Tîrmehê li hemû jinên Sûriyê, hemû rêxistin û kesayetên ku di van 10 salan de bi şoreşê re bûn û piştgirî dan şoreşê, li ber xwe dan û hewl dan, da ku em îro van rojan bijîn pîroz dikin. Em wan hemûyan silav dikin. Em hemû şehîdên têkoşîna azadiyê silav dikin. Ji bo em van rojan bijîn û şoreşa xwe ragihînin, bibin hêz û parastinê ava bikin û xwe bi rêxistin bikin, ew şehîd ketin. Em hemû şehîdan bi bîr tînin û bejna xwe li hember wan ditewînin.

Darxistina Foruma Şoreşa Jinê, em weke erkeke stratejîk a hemû jinan dibînin. Ji ber ku şoreşa me xwe dispêre nirx û têkoşîna sed salan ku jin ji bo azadiyê xwe feda kiriye. Ev nirxên ku jin û rêxistinên jinan di dîrokê de afirandine, îro şoreşa me xwedîderketina wan e û mîrateya wê ye. Ji bo parastina van nirxan serkeftina şoreşa me ya îro serkeftina hemû jinan e.

Di van 10 salên şoreşê de me çawa xwe rêxistin kir? Me çawa dest pê kir? Me çawa biryara şoreşê da? Me stratejiya şoreşê çawa destnîşan kir? Ev hemû ji bo hemû jinan biryarên stratejîk bûn. Ji sala 2012'an û vir ve hemû rêxistinên jinan çalak bûn xebat û ked dane meşandin. Bi rengên cuda û rêxistinên jinan ên xweser ên weke Yekitiya Star (Niha Kongra Star) û xebatên jinan ên di nava partiyên siyasî de helwestek, berxwedanek, lê şert û mercên gelekî dijwar hebûn. Em hîn bi qasî ku diviyabû bi rêxistin nebûn. Lê weke jinên Rojava me di destpêka şoreşê de karîbû biryarên stratejîk bigrin. Ji ber vê yekê divê em li dijî hemû polîtîka û zîhniyetên ku sed sal in li ser jinê tê meşandin, xwedî biryar û stratejîk tevbigerin. Ger em li dijî van polîtîka, rêgez û zagonên ku bi destên mêran li dijî jinê û têkoşîna azadiya jinê hatine nivîsandin û bi destên pergalê hatin pêk anîn têkoşin nekin, li dijî van rêgezan xwe birêxistin nekin, şer nekin li dijî wan, wê demê em nikarin bibin alternatîf û şoreşê bikin.

Di sala 2012'an de ji xwe mîrasek me ya dewlemend hebû û şoreşa me jî li ser mîrasa jinên şoreşger ava bû. Di dawiya salên 80'î de û bi taybetî jî di salên 90'î de li Rojava pêleke mezin a jinên şoreşger pêş ket. Di şexsê Dîcle Kobaniyê de Şîlan Kobanî, di kesayeta Zeyneb, Şervîn, Dîlan û Rêhanê de û bi sedan jinên şoreşger di rojên herî dijwar de biryar dan ku di rêya azadiyê de bimeşin. Û çûn qadên têkoşîna azadiyê, ji bo parastina jin û nirxên netewî yên Kurd û gelan têkoşiyan û dest bi şoreşê kirin. Ji ber vê sedemê jî em dikarin bibêjin ku di vê qonaxê de ev bi sedan jinên pêşeng ji bo me bûn şansek ku em bibin rêxistin, têkoşîn, îrade, nasname û li hember wan dengên ku dibêjin jin nikare şoreşê bike, nikaribin xwe biparêzin, siyasetê bikin, rêxistinekê ava bikin. Tekoşîna jinan li hemberî van nêrînan berxwedanek mezin kirine. Vê yekê bandorek mezin li ser civakê kir, bandorek mezin li ser malbatan kir. Ji bo me îmkan û derfet çêbû ku em rêxistina jinan pêş bixin û salên dirêj xebat hatin meşandin. Ev bû bingehek ku di sala 2012'an de li ser tevgera jinê gelek nirxandin hatin kirin û gelek platform hatin afirandin.

Yekitiya Star di sala 2013'an de kongreya xwe li dar xist. Li ser wê yekê nîqaş hatin kirin ku em çawa dikarin şoreşê bikin? Em ê çawa xwe amade bikin? Û em ê çawa bi hev re du şoreşan bikin? Şoreşa jinê û şoreşa gelên demokratîk. Li ser vê bingehê biryarên stratejîk hatin girtin. Yek ji biryarên stratejîk jî ew bû ku ger parastina jin nebe , em nikarin şoreşê bikin û rêxistin bikin. Ji bo vê jî bi pêşengiya bi sedan jinên ciwan hêzên parastinê yên şoreşê hatin pêşxistin. Bi îmkanên pir hindik, lê îradeyek xurt. Ji bo pêkanîna şoreşê gund bi gund, tax bi tax amadekarî hatin kirin.

Di van amadekariyan de xebatên stratejîk hene: 1. xweparastin 2. rêxistinkirina jinên xwedî nasnameya xweser. Ger em bi nasnameya xweser xwe bi rêxistin nekin, em nikarin li vî welatî sîstemeke demokratîk ava bikin. Ger em xwe bi rêxistin nekin, em guhertin çênekin em nikarin mafên jin misoger bikin. Bêyî avakirina sîstemeke bi nasnameya jinê ya li dijî zilma li ser zilam, ev yek ne pêkan e. Li hemberî van sînorên ku ji bo jiyana jinan hatin zelalkirin têkoşîneke xurt hate meşandin. Belkî di destpêka şoreşê de gelekan digotin "divê jin çawa şoreşê bike?

Gelek kes gotin ku divê pêşî şoreş bi dawî bibe, piştre jin li ser pirsgirêkên xwe biaxivin. Ev jî argumaneke ku demeke dirêj li dijî têkoşîn û rêxistinbûna jinê dihat meşandin. Lê di vê serdemê de biryar hate girtin ku şoreşa jinê û şoreşa civakî bi hev re bên meşandin. Şoreşa jinê û şoreşa demokrasiyê wê bi hev re pêk werin. Şoreşa jinê û şoreşa neteweyî wê bi hev re pêk were.

Ger şoreşa jinê pêş nekeve, ne şoreşa demokratîk û ne jî neteweyek pêş dikeve. Ger şoreşa jinê pêş nekeve, di civakê de guhertin çênabe, di jiyanê de jî guhertin çênabe. Ev raman, ev zîhniyetên ku bi sedsalan li dijî vîna jinê xebitîne, dixwaze xwe zindî be. Şoreşa jinê şoreşa zihniyetê ye.

Şoreşa ku li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê hat kirin, şoreşeke zîhniyetê derxist pêş. Li hemberî hemû zîhniyetên mêtingerî, navendîparêzî, şoreşa zihniyetên demokratîk hate afirandin. Şoreşa jinê esas e û bûye bingeha şoreşa Bakur û Rojhilatê Sûriyê. Şoreşa jinê bû bingeha projeya Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê. Bi vê nasnameyê jinan li Bakur û Rojhilatê Sûriyê xwe bi rêxistin kirin. Yek ji stûnên bingehîn ên şoreşa jinê, tifaqên jinan bû, ev xebateke stratejîk bû, xebateke hevpar a hemû jinan û rêxistinan bû, hêza jinê kirin yek û bi vê yekê me serkeftinek mezin bi dest xist.

Bi xebat û hevgirtinên jinan ên li Bakur û Rojhilatê Sûriyê em gihiştin astekê ku em li cîhanê bibin mînak. Xebatên parastinê, avakirina sîstemeke demokratîk a di civakê de, ev jî karên bingehîn bûn. Herî dawî rê li ber jinan vebû ku karibin derbasî hemû qadên têkoşînê bibe û derbasî qada azadiyê bibe. Herî dawî jin ji malên xwe derketin. Diwarên ku li pêşiya jinan sekinîn herî dawî bi Şoreşa Jinê re hatin rakirin û qadên azadiyê hatin avakirin û hemû jin bi rengê xwe, bi nasnameya xwe, bi ramana xwe, bi vîna xwe dikarin beşdarî hemû qadên şoreşê bibin û pêşengiya şoreşê bikin. Ev mozaîka îro li vir îfadeya wê ye. Ger em îro li asta Sûriyê binêrin, ku zêdetirî 50 rêxistinên jinan, nasnameyên netewî, nasnameyên çandî û baweriyan em îro li vê salone bi hev re ne, me şoreşek pêk anî. Îro em bi hev re şoreşa 10 salan dinirxînin û pêşeroja xwe bi hev re destnîşan dikin.

Ev jî ji bo hemû jinên Sûriyê, herêmê û hemû jinan serkeftineke mezin e. Bi rastî jin di şoreşê de berdêlên mezin dane. Ên di hemû qadên jiyanê û berxwedanê de bi fedekarî ked dane, jin bûn, dayik bûn, endamên YPJ'ê bûn û niha bi hezaran birîndarin ku li eniyên berxwedanê li ber xwe dane û parçeyên bedena xwe feda kirine hene.

Berxwedana ku li herêma me hat afirandin ji bo cîhanê mînakek e. Çawa hate afirandin? Li ser çi bingehî çêbû? Li ser kîjan ramanê ava bû? Li hemberî hemû êrîşan hêz û îradeya xwe çawa pêş ket û bi ser ket? Şoreşa me li ser fikir û felsefeya jiyana azad, jina azad, nasnameya jina azad ava bûye. Şoreşa me bi rengê jinê, bi ramana jinê, bi raman û hêza jinê, bi nasnameya jinê hate pêşxistin. Îro li kuderê ev pêk bên, jin lê hene, li cihê ku ev nebin, rewşa jinan pir xetere. Tiştekî mîna Şengalê dîsa dibe.

Tişta ku îro li herêmên dagirkirî li dijî jinan diqewime wê dubare bibe. Li Efrîn, Serêkaniyê, Girê Spî, Îdlîb, Cerablûs, El Bab, Ezazê îro qirkirina jinan tê kirin. Ji ber ku dagirkeriyeke weke îro û di dîrokê de her ku pêk hatiye, bi tinekirina jinan, bi qirkirina jinê hatiye kirin. Li dijî van êrîşên ku li herêmên dagirkirî li dijî jinan tên kirin, divê em têkoşîna xwe xurt bikin. Divê em asta berxwedana xwe bilind bikin. Armanca me ew e ku em van hemû jinan ji dagirkeriyê, ji komên çete rizgar bikin. Armanca me, biryara me û têkoşîna me wê ji bo jinan bibe bersiv. Ji ber vê yekê em ê bibin bersiva hewldan û berxwedana dayîk û şehîdan. Li pêşiya me têkoşînek dirêj heye. Belkî di van 10 salan de me şoreşeke ku gihiştiye astekê kiriye, em bûne nasname, bûne ê xwe, îro em jin ê xwe ne. Bi hêz, raman û îradeya xwe em li ser piyane. Ev fikir, hêz, vîn û felsefeya ku Abdullah Ocalan di van 40 salên dawî de ji bo tevahî têkoşîna azadiya jinê, ji bo parastina jinê û rêxistinbûna jinê daye pêş, ev ji bo hemû jinan îro hêzeke mezin e. Li ser esasê vê felsefeyê em dikarin bi reng û nasnameya xwe xwe bi rêxistin bikin. Em dikarin têkoşîna azadiyê bilind bikin.

Jinên ku ne xwedî stratejiyek bin, ne parastin, ne sîstemek li gorî îdeolojiya azad ava kirine, li cîhanê qirkirina jin a mezin heye. Ji bo pêşîgirtina li van komkujiyan, ji bo pêşîgirtina li êrîşan, divê em tiştên ku heta niha bi dest xistine, ji bo şoreşa me bûye bingeh xurtir û zêde bikin. Em weke rêxistin û tevgera jinan divê hêzên parastinê xurt bikin.

Berpirsiyariya me hemûyan ev e, li hemberî êrîşan em hemû YPJ, HPC ji bo ewlehiya gund, bajar û taxên xwe em hêzên xwe yên parastinê ne. Di siyasetê de em vîna hemû jinan temsîl dikin. Divê jin di biryarên siyasî de cih bigirin, li ser asta Sûriyê bibin hêzeke xurt, di çareseriya pirsgirêkên li Sûriyê de. Ji bo birêxistinkirina civakê divê em têkoşîna xwe berfireh bikin ji ber ku xeteriyên mezin hene. Divê em qada perwerde û zanînê xurt bikin.

Divê em hemû qadên jiyanê xurt bikin. Dema ku em dibêjin 'Jin Jiyan Azadî Ye' tê wê wateyê ku li cihê ku jin lê nebe, xweparastina jinê nebe, jiyan nabe. Cihê ku azadiya jinê tune be jiyan lê tune ye. Ji bo em li her derê jiyanê pêş bixin, divê em li her derê pergala jinê pêş bixin. Em dikarin zanebûna jinê pêş bixin, parastina jinê pêş bixin. Yên ku berê digotin û îro jî dibêjin "Pirsgirêka jinan tenê jinan eleqedar dike û em dikarin çareser bikin" şaş bûn. Pirsgirêka jinê pirsgirêka hemû civakê ye, ya azadiyê ye, ya bingehê civakê ye. Ger azadiya jinê nebe, di civakê de jî azadî nabe.

Ger pirsgirêka jinê çareser nebe, pirsgirêka gelan çareser nabe, pirsgirêka demokrasiyê çareser nabe. Di van têgeha de şoreşa me pêşketiye û em îro li vê derê ne. Li ser van têgehan em dikarin têkoşîna xwe mezintir bikin. Li dijî hemû teoriyên li dijî azadiya jinê, nasnameya wê ya xweser û têkoşîna wê, divê em têkoşîneke hevpar bimeşînin. Heta îro em weke jin xwedî dîrokeke dirêj, têkoşîneke hezar salan e ku ji bo me mîraseke mezin e. Şoreşa jinê ya li Rojava û Bakurê Sûriyê jî ji bo hemû jinan serkeftin û hêzeke mezin e.

Em dikarin bi têkoşîn û tifaqên xwe yên hevpar vê şoreşê biparêzin û bilind bikin, bikin malê hemû jinan. Hemû jinên ku li herêmên dagirkirî dijîn, li dijî dagirkeriyê li zindanan li ber xwe didin, li çiyayên azad li dijî faşîzmê çîrokên lehengiyê dinivîsînin, ê ku bi darê zorê hatine koçberkirin û niha li derveyî gund û bajarên xwe dijîn, em wan hemûyan silav dikin. Têkoşîna me, biryar û berxwedana me wê her tim bi armanca pêkanîna hêvî û daxwazên we û bilindkirina ala berxwedanê li dijî hemû tundiya li ser we tê kirin. Em ji we hemûyan re serkeftinê dixwazin.

## Destkeftiyên şoreşa jinan li Bakur û Rojhilatê Sûriyê

Sema Bektaş - Berdevka Partiya Yekitiya Demokrat PYD

Em salvegera dehemîn a Şoreşa 19'ê Tîrmehê silav dikin û li ser esasê destkeftiyên Şoreşa Rojava dikevin qonaxeke nû ya têkoşînê. Ev şoreşa ku yek ji şoreşên pîroz ên dîrokê tê dîtin e û ne kêmtir ji şoreşa sosyalîst a destpêka sedsala bîstan, ku bandora wê berbelav bû û tevahiya sedsalê nîşan da ye, guhertinên girîng pêk anî.

Şoreşa Rojava ya li ser bingeha exlaqî ava bû û bêyî ku xwe bike navenda her tiştî û mafê êrîşa li ser xwezayê bide xwe weke ku em di kapîtalîzmê de ji bo qezenca herî mezin dibînin lê jiyanaek bi hevsengiya xweza û jîngehê pêşdixîne.

Şoreşa Rojava ya ku di destpêka sedsala bîst û yekê de pêk hat, xwedî taybetmendiyên wê ye ku wê ji şoreşên berê cuda dike, lewra bandora wê li hemû deverên cîhanê belav dibe û geşedanên dîrokî bi xwe re tîne. Şoreşa Rojava sembola serdema me ye ku dikare azadiya hemû mirovahiyê pêk bîne. Şoreşa Rojava bi dirûşima "Jin, Jiyan, Azadi" weke şoreşa jinê hate naskirin û bi vê dirûşmê wê azadiya hemû civakê jî pêk bîne. Jin beşdarî berxwedan û serhildana gel bûn, li gel pêkanîna erkên malbatê, fedekariyên mezin kirin û berpirsyariya şoreşê hilgirtin.

Pêwîste em behsa zehmetî û zordariya ku jin di bin rejîma Bais de jiyan kirine bikin; jinên têkoşer hene ku heta îro jî çarenûsa wan ne diyar e. Lê îro jin bi rêya rêxistina Kongra Star û Yekîneyên Parastina Jin YPJ'ê dikarin nasnameya xwe îfade bikin. Jin xwe îspat kiriye û di siyaseta demokratîk û cîhê biryargirtinê de roleke girîng lîstiye. Şoreşa Rojava û Bakurê û Rojhilatê Sûriyê ji bo jinên azadxwaz, bû ronahiyek.

Destkeftiyên şoreşa jinê bandor li hemû aliyên cîhanê kiriye. Giyanên şoreşgerî û berxwedaniya jinê xurtir kiriye. Hêjayî bibîrxistinê ye ku şoreşa Rojava bi tevgera jinên Kurd a ku zêdetirî çil sal in ji bo azadiya jinê têdikoşe, hêz girtiye. Li gorî fikrê Abdullah Ocalan, jin bi vîna xwe ya azad ku ji koletiya bi hezaran salan rizgar kir, dikaribû beşdarî şoreş û pêşketina civakê bibe. Jina Kurd û xwişkên wê yên Ereb, Asûrî, Suryanî, Keldanî, Ermenî û Tirkmen û hwd. bûne hêza guhertin, nûjenkirin û pêşketina civakê. Her wiha karîbûn ji firsend û mercên dîrokî yên ku li Sûriyê hebûn sûd werbigirin û şoreşa jinê bidin destpêkirin. Serkêşiya şoreşê dikin û bi awayekî aktîf beşdarî hemû sazî, dezgeh û rêxistinên bakur û rojhilatê Sûriyê dibin. Li jêr em girîngtirîn destkeftiyên şoreşa jinê yên di deh salên dawî de bi kurtî vedibêjin.

Jinan di hemû qadan de pêşengtî kiriye. Ji sala 2014'an û vir ve ku Rêveberiya Xweser hate avakirin, di pêşxistin û pêkanîna wê de rola herî girîng jinan lîstiye. Sîstema xwerêveberiyê xwe dispêre ramana netewa demokratîk ku li ser fikir û felsefeya Rêber Abdullah Ocalan hatiye avakirin. Ji ber vê yekê jinan di hemû desteyên rRveberiya Xweseriyê de rola xwe lîstiye, weke Meclisa Rêveber ku yekem car jinek bû Seroka Meclisa Rêveber a herêma Efrînê. Her wiha 4 jin weke serokên desteyên sereke (aborî, çandî, derayi, jin) hatin erkdarkirin. Li hemû sazî û rêveberiyan meclîsên şêwrê û buroyên taybet ên pirsgirêkên jinan hatin avakirin. Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê di Nîsana 2016'an de sîstema hevserokatiya hemû deste û nivîsgehan

bi fermî pejirand. Li gorî peymana civakî ku makeqanûna herêmî ya ji bo xwerêveberiyê ye, kotaya zayendî ya ji sedî 50 hate qebûlkirin û ev prensîb ji şaneya herî biçûk, şaredarî heta asta herî bilind a rêveberiyê di pratîkê de tê sepandin. Bi rizgarkirina herêmên din ji lepên çeteyên DAIŞ'ê ji aliyê Hêzên Sûriya Demokratîk ve, Rêveberiya Xweser ber bi deşta Bakur- Rojhilatê Sûriyê ve hat berfirehkirin, ku niha ji sê rêveberiyên xweser pêk tê: Cizîr - Efrîn - Firat û çar rêveberiyên sivîl li Reqqa - Tebqa. - Dêrezor - Minbic. Li herêmên ku ji DAIŞ'ê hatine rizgarkirin gelek jin tevlî rêveberiya xweser bûne.

Rêveberiya Xweser di wê baweriyê de ye ku sîstema hevserokatiyê çareseriya herî baş e ji bo pêşîgirtina li biryarên yekalî (bi piranî ji aliyê mêran ve). Di hemû mijarên îdarî de di hemû astan de, jin û mêr bi awayekî wekhev beşdar dibin. Yekem car li Bakur û Rojhilatê Sûriyê sîstema hevserokatiyê di sala 2012'an de di kongreya pêncemîn a Partiya Yekîtiya Demokratîk de pêk hat, di sala 2013'an de li şaredariyan û Tevgera Civaka Demokratîk û di sala 2016'an de di Reveberiya Xweser de ew sîstem hate pêkanîn. Ev prensîb tê sepandin û weke xaleke bingehîn a peymana civakî ya vê dawiyê hatiye amadekirin tê dîtin. Di çarçoveya şoreşa jinê de di sala 2014'an de Qanuna Jin hate derxistin û di vê çarçoveyê de mafên jinan hatin parastin û qanûnên weke qedexekirina zewaca zarokan, kuştina namûsê, pirjinî, îstîsmara zayendî, tundiya malbatê hatin amadekirin. Ji bo wekheviya mûçe û mîrasê zagon hatin derxistin.

Di şoreşa Rojava de jinan bi nêrînên jinan li ser asta herêmî, neteweyî û navneteweyî karîbû siyaseta demokratîk xurtir bikin. Ji ber vê yekê bi rêxistinên jinan ên di nava partiyên siyasî re gelek peyman çêkirin, di rêveberiya xweser de hişmendiya jinan pêş xist û bi gelek rêxistinên jinan re yekitiyek çêkir. Îradeya xurt a rêxistinên jinan karîbû nasnameyeke siyasî ya serbixwe ji bo derbaskirina astengan û parastina mafên xwe û çareserkirina pirsgirêkên civaka xwe bi dest bixe. Ji bilî beşdarbûna jinan di nava partiyên siyasî û cihên biryardanê de û ji holê rakirina îmaja qalibê ku jin beşdarî siyasetê nebin, ku ji çarçoveya malbatî û eşîrtiyê tê, geşedanên din jî rû didin.

Di pergala kapîtalîzmê de bi taybetî jin û keda wan ji bo qezençkirinê weke maddeyek ji bo kirîn û firotinê tên îstîsmarkirin. Şoreşa jinê ya li vir, ji têgînên mêtingerî û yekdestdariyê dûr, ji bo jinê têgînên aboriya komînal ava kir. Projeyên komunal hatin afirandin û derfetên ku jin debara xwe bikin hatin afirandin. Komîteyên aborî yên jinan ji bo bidestxistina serxwebûna aborî bi awayekî aktîf di organîzekirina atolyeyên perwerdeyê û bernameyên geşepêdanê de cih digirin.

Li Bakur û Rojhilatê Sûriyê Meclîsa Edeleta Jinê ji bo pêşxistina edaletê û parastina mafên jinan hate avakirin. Bi hemû sazî û dezgehên ku di çareserkirina pirsgirêkên edaletê yên ku jin ji ber cudakariya zayendî rû bi rû dimînin re dixebite.
Di avakirina sîstema edaleta civakî de, xwe dispêre hêza prensîbên exlaqî yên ku civak li ser wan hatiye avakirin, weke edalet, wekhevî û demokrasiyê. Jin di pêkanîna vê rêbazê de bi rêya komîteyên lihevanînê û mala jinan li her tax û herêmekê ji bo çareserkirina pirsgirêkên malbat û civakê û rênîşankirin, hêzkirin û teşwîqkirina jinan ji bo naskirin û daxwaza mafên xwe, roleke girîng dilîzin.

Xweparastina rawa yek ji rêgezên bingehîn ên projeya netewa demokratîk a parastina hebûn û jiyanê ye. Bi taybet ji hêla jin girîngiya avakirina parastina xwe li hemberî her cure şîdeta baviksal-

ariyê hate dîtin. Li ser vê ferasetê gelek jin daketin qadan û ji bo parastina taxên xwe û gelê xwe tev li HPC Jin (Hêzên Parastina Sivîl a Jin) bûn. Asayîşa Jin di sala 2013'an de hat damezrandin û armanca wan ya sereke têkoşîna li dijî hemû cureyên tundiya li ser jinan di civakê de, parastina wan ji destdirêjî, kuştin û zewaca bi darê zorê, cîbicîkirina qanuna jin û herwiha parastina ewlehiyê ye û parastina aramiya gund û bajaran ji êrîşên vekirî an bûyerên belavbûna narkotîkê, tundî û pevçûnan e. YPJ (Yekîneyên Parastina Jin) di 4'ê Nîsana 2013'an de hate avakirin. Jinên Bakur û Rojhilatê Sûriyê ji bo parastina xaka xwe li dijî DAIŞ'ê li eniyên herî pêş şer kirin. Di dema ku piraniya welatan ditirsiyan ku çawa li dijî vê terorê bisekinin, jinan DAIŞ tine kirin. Û ew bû çavkaniya îlhamê li ser asta gerdûnî. Her wiha berpirsyariya azadkirina jinên ku ji aliyê DAIŞ'ê ve hatibûn revandin û kolekirin girtibûn ser xwe. YPJ'ê karîbû fikra têkoşîna azadiyê ya jinan li hemû cîhanê belav bike. Ev bû sedem ku ji çar aliyên cîhanê jin tevlî refên wan bibin û bigihîjin asta şehadetê.

Berxwedan û têkoşîna jinên Rojava li her derê hate zanîn û ji bo hemû jinan bû çavkaniya îlhamê. Bi vî awayî li Bakur û Rojhilatê Sûriyê deriyên ku berê di qada dîplomasiyê de girtî bûn, ji bo jinan hatin vekirin. Di qada dîplomasiyê de hebûna jinan li cîhanê îro jî gelekî kêm e. Lê belê di Şoreşa Jinê de jinan di nûnertiyê de rola pêşeng lîst û li qada navneteweyî bû dengê gelê xwe. Jinên Kurd bi darxistina yekemîn kongreya netewî ya jinên Kurd li Amedê beşdarî erka xwe ya netewî ya xurtkirina xebata yekîtiya netewî ya Kurd bûn. Kongreya duyemîn li Hewlêrê hate darxistin û kongrea sêyemîn jî li Rojava wê bê lidarxistin. Jinan ji bo têkoşîna hevpar a rêxistinên jinan ên li Sûriyê bi hemû pêkhate, ol û rêxistinên cuda re bi avakirina têkiliyan, pêşxistina tifaqan û bi gel û rêxistinan re platformên hevpar ên li dijî kapîtalîzm, faşîzm û zilmê ava kirin. Vê yekê hişt ku gelek şande serdana herêmê bikin, xelekên lêkolîn û lêkolînan amade bikin, pirtûk binivîsin, filman bibelge bikin û ji ezmûna şoreşê fêr bibin û ji xwe re mînak bigirin. Gelek kes jî tevlî şoreşê bûne û hinek ji wan jî ji bo vê şoreşê şehîd bûne. Jinan ji bo avakirina navendên lêkolîn û agahdarkirinê û pêwîstiya xebatên dîplomatîk ên jinan ji bo xwendin û belavkirina bûyerên rojane bi perspektîfa jinan xurt kirin.

Bi destpêkirina şoreşê re jinan roleke girîng di çapemeniyê de lîst, mînak: di radiyo, ajansên nûçeyan û kanalên televîzyonê de. Bi sedan jin di çapemeniyê de bûn deng û wêneyê berxwedanê. Di qada medyayê de xwe îspat kirine û li dijî her cure cudakariyê xebateke xurt kirine. Wê bi pênûs û dengê xwe dest bi tehlîlkirina rastiya siyasî kir û di çapemeniyê de li ser sê eniyan têkoşîn kir: Zîhniyeta baviksalarî ya ku li civaka Rojhilata Navîn de serdest e, êrîşên dewleta Tirk û êrîşên DAIŞ'ê. Ne tenê nûçeyan dişopand, di eniyên şer de jî amade bû û di ragihandina zelal û eşkerekirina rastiyên têkildar de rolek girîng lîst. Jiyana xwe jî xistine metirsiyê û hinekan jî ji bo wê canê xwe feda kirine.

Li gorî Yekîtiya Ragihandina Azad li Bakur û Rojhilatê Sûriyê rêjeya jinan di medyayê de %70 e. Di sala 2020'an de Yekitiya Ragihandina Jinan hat avakirin ku di nava xwe de xebatkarên çapemeniyê û rojnamegerên jin di nav de cih digirin. Di 8'ê Adara 2018'an de yekemîn weşana Jin TV ku kanala satelîtê ya jinan e hate weşandin. JINHA, ji bo gihandina dengê jinan, ronîkirina nasname, têkoşîn, çalakî, deng û rastiya jinan a li ser asta Bakur û Rojhilatê Sûriyê ajansa nûçeyan a jinan hate avakirin.

Li bakur û rojhilatê Sûriyê bi dehan akademiyên jinan hene ku di hemû qadan de (siyaset, mafên mirovan, jinên ciwan, dîplomasî, jin, jineolojî, trafîk, perwerde, ewlekarî) perwerde didin jinan.

Kongra Star di sala 2005'an de di dema desthilatdariya rêjîma Sûriyê de hat damezrandin û heta destpêka şoreşê bi awayekî veşartî kar kir. Bi destpêkirina şoreşê re xebatên komîteyên li ser asta gund, bajar û navçeyan ên li ser asta Rojava bi awayekî xurt pêş ketin. Li Silêmaniyê (Herêma Kurdistanê), li Lubnanê, li Ewropayê, Şamê şaxên wê hene.
Meclisa Jinên Sûriyê di sala 2017'an de hat damezrandin da ku nêrînên jinên Sûriyê yên li hundir û derveyê Sûriyê bi hemû pêkhateyên etnîkî, netewî, çandî û bîrdozî re yek bike da ku jin di nivîsandina destûrê û garantîkirina mafên jinan de biryaran bidin û nûneratiyeke rast ji jinan re hebe.

Meclisa Jinan a Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê di sala 2019'an de hat avakirin û sîwaneke siyasî, mafên mirovan, civakî û çandî ye ku hemû rêxistinên jinan û ofîsên jinan ên di nava partiyên siyasî û rêxistinên civaka sivîl ên ku bi pirsgirêkên jinan re mijûl dibin, dihewîne. Armanca wê parastina destkeftiyên jinan li Bakur û Rojhilatê Sûriyê, xurtkirin û pêşxistina zagonên jinan û pêkanîna wan e.
Yekîtiya Jinên Suryan di sala 2013'an de hate damezrandin û armanca wê rêxistinkirina jinên Suryanî, Aşûrî û Keldanî, zindîkirina dîroka wan û parastina çanda wan e.
Tevgera jinên ciwan di destpêka şoreşê de roleke girîng lîst û di dema şoreşê de karibû çalakiyên ciwanan li hemû herêman bi pêş bixe û akademiyên veke û gelek jinên ciwan ji bo ku di civakê de roleke aktîf bilîzin perwerde bike.
Weqfa Jina Azad di 5'ê Îlona 2014'an de hatiye avakirin û komeleyeke serbixwe ye ku di gelek waran de hêz dide jinan û derfetên kar ji wan re vedike.
Rêxistina Sara ya Têkoşîna li Dijî Tundiya Li Ser Jinê di sala 2013'an de hatiye avakirin û li dijî her cure şîdeta fîzîkî û derûnî ya li ser jinan têdikoşe.
Tevgera Çand a Jin (Hilala Zêrin) di sala 2016 de hate damezrandin û ji bo pêşkeftina çand û hunerê jinê di çarçoveya çandek şoreşgerî ya li dijî asîmîlasyona çandî de dixebite.
Jineoloji zanisteke nû ye ku ji aliyê Abdullah Ocalan ve hatiye pêşniyarkirin û ji aliyê tevgera jinên Kurd ve hatiye pêşxistin. Bi Jîneolojiyê re hemû zanist bi perspektîfa jinê ji nû ve tên lêkolînkirin. Armanca vê nêzîkatiyê derbaskirina pirsgirêkên civakî û kêmasiyên ku ji aliyê baviksalarî û kapîtalîzmê ve hatine afirandin e.
Kombûna Jinan a Zenûbiya di sala 2021'an de li herêmên rizgarkirî hat damezrandin, û jinên Reqa, Minbic, Dêrezor û Tebqayê bi rêxistin dike.
Meclisa Jinên Êzîdî di sala 2021'an de hat damezrandin, ew bi pirsgirêkên jinên Êzidî eleqdar e û jinên Êzidî yên ji destê DAIŞ'ê hatine rizgarkirin, digihîne malbatên wan, herwihya ji bo vejîna ol û çanda Êzidiyan dixebite.

Di dawiyê de şehîdên ku di rêya van destkeftiyan de şehîd bûne û xwîna xwe ji bo azadiya jinê feda kirine bi bîr tînim. Jin bi hev re van destkeftiyan diparêzin û hewl didin ku zêdetir pêş bixin û ji bo hemû jinên Sûriye, Rojhilata Navîn û cîhanê bikin mîras. Şoreşa Rojava nîşaneya wê yekê ye ku ev serdema nû wê ji bo hemû mirovahiyê bibe serdema azadî û demokrasiyê.

## Şoreş bandoreke çawa li jinên cîhanê kir?

Rojda Dandara – Hunermend ji Brezîlya

Di serî de ez hemû şehîdan bi bîr tînim, yên ku şoreşa Rojava û şoreşên dîtir ên cîhanê zindî kirin. Bê wan me şoreş cênekirba. Ji ber vê berpirsyartiya me ye ku em hemû tekoşînên şoresgerî berdewam bikin. Li vir em tecrûbe, zanebûn û çand parve dikin. Bi parve kirinê û dan û standin em bi hev re jiyan dikin. Em ji cihan, insanan û çandan fêr dibin. Bi vî awayî agirê hêviyê geş dibe. Bi tenê nabe. Ji bo jiyan û şer kirinê pêwîstîya me bi hev du re heye. Wekî Rêbertî digot: „Hêvî ji serkeftinê bi nirxtir e." Gelek têkoşer hêvî dikin ku qedera xwe bi xwe diyar bikin ji bo ku jiyana rojane ronî bikim. Di jiyana xwe de em bi salan rêbazên cûda cûda diceribînin bo ku em rastiya jiyanê biguherin. Tê bîra min, dema min dest bi şanogertî kir, min xwest di nav cîhanê de guhertin cêbikim. Min alternatîvên cûr bi cûr ceriband, heta ez rojekî ketim ferqê ku di serî de pêwîst e ez dîroka xwe biguherim û tevlî gelên têkoşer bibim.

Gelê kurd şoreşa azadiyê di sedsala 21'ê mîn de bi pêşengtiya jinan pêkanî. 10 sal şoreş! Em jî, wekî hevanlên enternasyonalîst, em li vir parastinê dikin, berxwe didin, parve dikin, rojane kar dikin, ji ber ku hûnera şoreşa Rojava enternasyonalîst e. Ji ber ku hûnera şoresa Rojava pir bi eslê jinan û koka gelekî ku bi cesaret şerê dijî baviksalarîyê, mêtîngeriyê, emperiyalîzmê, kapîtalîzmê û lîberalîzmê dike, ve girêdaye. Eger me dîroka vê têkoşînê ser sahne pêşkêş kiriba, we gelek jin ku tekoşîn dikin yên mînaka rûmetê, evînê, hêzê û destekftiyan e hatibana dîtin.

Dema em xwe wekî jin di bin ronahiya şoreşê binêrin, em jinan dibînin ku me anîne cîhanê û beriya wan em jinan dibînin ku dayîkên me anîne cîhanê û beriya wan yên dîtir û dîtir û me hemû. Dema em xwe wekî jinên enternasyonalîst binêrin, di nav hêza şoreşê de, em dizanin em çi dixwazin û em dizanin ku em dikarin baweriya xwe bi utopyan bînin ku bi xebatên rojane şêwazên fikrandinê û jiyanê yên azad û adil zindî dibe. Em biçin kuderê jî, erka me pêşxistina kesayeta xwe û bûyîna yek bi civakê re ye. Ji bo em bibin çalakvan, pêwîst e em bi rêya têkîliyên çandî, têkîliyên polîtîk û sosyal xwe nas bikin. Her kesê ku em naz dikin gelek reng û ezmûnan li jiyana me zêde dike. Ji ber vê min navê ROJDA li xwe kir. Û herî dawî jî min navekî dîtir rakir: Dandara. Di dîroka Brezîlya de ew jinekî girîng di têkoşîna mirovên rêş de bû. Piştî rizgarkirina xwe, ew di sala 1694 întîhar kir ji ber nedixwest carek din bibe kole.

Bi gelê vê şoreşê, bi jinên kurd û çanda heremê, ez roj bi roj girîngiya rizgarkirina xwe ji zihnîyeta baviksalarî ya ku êrîşê bedenê jinan dike û jinan nexweş dixe û ji zihnîyeta mêtîngeriyê ku ji emperyalîzmê ve hat çandin dibînim. Dema em mirovên ku bi çanda xwe ve girêdayîne dinêrin, em cesaret ji bo derbas kirina sînoran digrin. Em cesaret digrin ji bo ku em xwe biparêzin û şer bikin, ji bo ku em bikaribin çanda welatên xwe îfade bikin bi taybet dema em behsa welatan dikin ku emperyamlizm û baviksalarî tê de bi şîdetekî çors diyar dibin wek li Amerîka Latîn, Efrîka û Asya. Naye qebûl kirin ku di roja me ya îro de jin wekî milkê zilam were dîtin û ji bo vê sedemê bê kûştin. Di sala 2021'an de li Brezîlya her 10 deqe ser jineke destdrêjî hat kirin û her 7 saet jineke hat kûştin. Heman demê de yên sûcdar bi rêya hûqûqê ji bo berjewendiyên aborî tên parastin. Dibe ku ew difikirin ku ew dikarin me tune bibin, ji ber fêm nekirine ku hêza afirandinê û tovên jiyanê em in. Ji ber vê yekê erka me, wek mîlîtanên vê şoreşê, ev e ku em şer bikin, cîhanekî nû

biafirînin û werin ser sahne. Ne tenê sahneya şanoyê le belê sahneya jiyanê jî. Em hêza xwe ji wan şervanan digrin ku şehîd ketin lê nav me de jiyan dikin.

Enternasyonalîzma sedsala 21'ê mîn ne tenê hêza yekîtiyên tevgerên sosyalîst û karkeran e. Rengên nû yên enternasyonalîzmê di nav tevgerên civakî de wekî yên femînîst û ekolojîst, dij nîjadperestiyê de, di teolojîya rizgarkirinê de, di parastina mafê mirovan û di piştgiriya hereketên civakî, wekî MST (hereketa karkerên bê ax yên Brezîlya) de derdikevin pêş. Mînaka berxwedana û tekoşîna jina kurd di cîhanê de belav bû ji ber têkoşîna jina kurd sînoran derbas kiriye jibo ku tecrûbeyên xwe yên serxwebûnê bi gelên dîtir yên xwecihî re, bi taybet bi Abya Yala re, parve

bike. Dema MST di salên 1980'an de hat damezrandin, fikrandinekî enternasyonalît di çarçoveya teoriya marksîst de çêbûye. Ev rêxistin ji têkoşînên berxwedanê yên gelên cûda cûda, wekî yên ji Amerkîka Latîn, bi taybet gelên xwecihî, fêr bûye û bi wan re parvekirinê pêşxistiye. Hemberî qirkirinê qebîleyên xwecihî di nava dilê daristanên Mato Grosso û Amazonas de li Brezîlya berxwe didin. 500 salan dagirkeriyê, kolebûnê û epîdemîkan derbas kirin. Kes nizane çend qebîleyên wan hene, belkî 300 yan jî zêdetir hene ku xwe wek netewên xweser birexistin dikin. Jinên xwecihî ji bo ax şer dikin, lê belê beriya hertiştî ji bo pêşerojê şer dikin, ji bo pêşerojê zarokan, ji bo me. Jinên xwecihî ji bo ên berê xwe şer dikin, ji bo mafê civaka xwe ya jiyan kirinê de, ji bo bikaribin zimanê xwe biaxivin, bo ku bikaribin biçin neçîrvantiyê, biçin ber çemê, ji bo ku bikaribin dermanên xwe yên kevneşop hilberînin, ji bo çanda xwe. Jinên xwecihî ji bo hebûnê şer dikin. Şer dikin ji bo mêjiyan ji nû ve şîn bikin da ku cîhan ji nexweşiyan xilas bikin. Girîngiya têkoşîna wan, wekî têkoşîna jinên cotkar yên MST, naye înkar kirin. Faqat roja îro de berpirsyarti-ya
me ye ku em trajediya wan jinan eşkere bikin. Em trajediya hemûyan ku şer dikin û berxwe didin yan jî şer kirin û berxwe dan eşkere bikin, ji bo ku dînamîzmên ku tevgerên civakî û polîtîk ava dikin û çîrokên ji ku perspektîfa jinan vedibêjin, werin fêm kirin. Bi vî awayî em çalakiyên xwe di nav civakê de bi hêz bikin. Pêwîst e em ji koka xwe hez bikin, pêwîst e em ji bedena xwe hez bikin û pêwîst e jî ku em ji xwe hez bikin.

Brezîlya ji milê mêtîngeran ve, yên ku koleyên efrîkî û mirovên xwecihî bi kar anîn, hat avakirin an em dikarin bêjin xerakirin ji bo berhemên xwezayî ku nirxê wan zêde bûye bidizin. Gelên xwecihî û gelên reş bi sedsalan hatin qetil kirin û berxwedan jî. Berxwedana xwe berdewam dikin ruxmê ku beşên dîroka xwe, çanda xwe û zimanên xwe winda kirin. Ez li vir porteqîzî diaxivim. Porteqîzî wekî zimana me ya dayîkê tê pênase kirin. Lê bes zimana dayîkê ya gelê Brezîlya zimana gelê xwecihî be ne rastir e? Ez zimana gelê xwe nizanim. Ez bi zimana mêtingeran diaxivim. Ez ketim ferqa vê dema min di şoreşa Rojava de berxwedanekî dij mêtîngeriyê li dijî dewleta tirk a faşîst dît.

Dîroka gelên cûda cûda bîngehê xwe ji berxwedanê digre. Û berxwedan pêwîst e dewam bike, pêwîst e îlham bide gelên dîtir ji bo ku ji bo nasnameya xwe ya çandî ya ku hebûna wan mîsoger dike, şer bikin. Jin mînaka herî baş ya berxwedanê di sedsala 21'ê mîn de ye ku beramberî pergalek ku jinan bi şîdetê bindest dike berxwe dide. Kapîtalîzm bi mantiqê globalbûnê, çanda takekesîbûnê, ya zilamê serdest, bi reqabet û zordestiyê, çandê weke bazara zayendperest dihesibîne û parastina ekolojîk û çandî ya gelan asteng dike.

Ji ber vê zehmetiya herî mezin çêkirina hebûna me bi rêya aktorên jinan, watedayîna çandê û afrandinekî hûnerî. Tenê mirov dikare çandê û hûnerê biafrîne. Çand encamê destê mirov e. Çand pêkanîna fikrê me, xeyal û xwestekên me ye. Çand eynika mirov bi xwe ye. Esl û koka mirov, eynika cîhanê ye. Çand firandina rastiyek e ku ji hêla xwezayê ve nikare were pêşdîtin, lê bi wê ve girêdayî ye.

Ji çandê hûner dikare were afirandin, ji ber ku hûnermend rastiya xwe dinêre, cîhana xwe dinêre û ji bo serêrast kirin û pîroz kirina çalakiyên mirov bi xwe çalak dibe. Ser vê esasî em wek enternasyonalîst dibin hûnermend dema em cîhanê dinêrin û alternatîfan avadikin, xwe diceribînin û şer dikin. Tişta ku PKK rojane nav şoreşê de ava dike, girseyeke serwext, azad û dildar ya mirovahiyê ye. Li gor ku Serokatî dibêje „Fêmkirina me ya azadiyê û têkîliyên azad ji dewlemendbûneke tê ku nav hereketên dîtir ên şoreşgerî nikare were dîtin“. Û ji vê pêşketinê mirovî, li vir wê di nav çandeke azad de bi avakirina însanyetekî nû bi pêşengtiya jinan, pêvajoya afirandinên mezin ên hûnerî pêşbikeve. 40 şagirtên min ên dîlanê hene ku rojane min fêrî hezkirina dîlanên foklorîk dikin. Bi kêfxweşiyekî ku belav dibe destên hev du digrin, mil û lingên xwe li gor rîtmê mûzîkê diherikînin. Gav bi gav dilên wan vedikim û bedenên wan ji bo hereket nû amade dikim. Ruxmê hemû cûdabûnan, tiştê ku di dibistanê de yekîtiya me ava dike, hezkirin e, têkoşîn e, afrandin e, hûrmet e û hêvî ye. Ser vê esasî tişta ku yekîtiya me wekî enternasyonalîstan ava dike, hezkirin e, têkoşîn e, afrandin e, hûrmet e û hêvî ye.

„… Em ber denge dahûl, ku me tîne gel hev, berxwedanê diçînin, ji bo em lingê xwe carekî din deynin ser rê…“ – jinên bê ax.

Bijî jinên enternasyonal! Bijî şoresa Rojava! Bijî PKK! Ez spasiya Serokatî dikim.

## Rola hêzên YPJ’ê di parastin û pêşxistina şoreşê de

Fermandara YPJ Şehîd Jiyan Tolhildan

Em vê forûmê silav dikin û hemû jinên Sûriyê, Rojhilata Navîn û cîhanê pîroz dikin. Em hemû şehîdên têkoşîna azadî û demokrasiyê, dayîk, hevrê û zarokên şehîdan, hemû rêhevalên ku parçeyek ji bedena xwe feda kirine û ji bo vê şoreşê birîndar bûne, pîroz dikin. çend roj berê me 10. salvegera şoreşa 19’ê Tîrmehê pîroz kir. Xebata we ya deh salên dawî, bi hemû reng, netew, ol û çandên xwe îro jî ev cîh xemilandiye. Ez weke fermandar û endama YPJ’ê serî li ber hemû şehîdên vê şoreşê ditewînim.

Her civak xwedî dîrokek e û ev dîrok tijî leheng û pêşeng e. Bi taybetî civaka Kurd û Ereb, Îranî û Tirk ku em bi hev re li vê herêmê weke cîranan dijîn. Pêşengên dîrokî her tim hebûn û îro xeleka wan li Rojava heye. Şopa pêşengên weke Besê, Sara, Zarîfe pêşketiye. Ev şop bi rola Warşîn, Roksan, Tolhildan Raman, Sosin Bîrhat û Şîlan Cûdî li Rojava derketiye holê. Ji bo xurtkirina hemû civakên ku îro li dijî pergala mêtingerî, dewlet û zilamê serdest têdikoşin, xwe feda kirine.

YPJ’ê gav bi gav ji gundên xwecihî yên Rojava (Rojavayê Kurdistanê) derbasî tevahiya herêma Sûriyeyê bû. Bi mutewaziya xwe û felsefeya xwe ya parastina hebûn û civaka xwe, li dijî çeteyên hov ên DAIŞ’ê yên ku li ser navê Îslamê her kesî dikuştin kirin. Niha jî em dibînin ku şervanan em ji hovîtî û tundî rizgar kirine. Ger em li hemû parzemînên cîhanê binerin, em dibînin ku bi rastî pergala netew-dewletê tiştek ji jin û civakê re nehiştiye.

Ji bilî xweparastin û têkoşîna me, ji bo afirandina ferdekî azad û civakeke azad ti rêyek din nîne. Bi vê boneyê em hemû jinên ku di nava vê şoreşê de cih digirin bi dil û can pîroz dikin. Û îro em wek YPJ’ê dikarin bibêjin ku bi hezaran jin, dayîk 10 salan bi ked û destên xwe ev ax veguherandine erdekî pîroz. Ji bo vê yekê ewqas qurbanî hebûn ku me dikarîbû bi saetan qala wan bikira û hemûyan rêz bikira. Her dayîk, her keç û her malbatekê xwe berpirsyar didît.
Yên ku hêza xwe nas kirin çek hilgirtin û cihê xwe di eniyên pêş de girtin. Bi xwebawerî û bêyî ku li paş xwe binerin, bêyî ku bibêjin ev Ereb, Suryan, Ermenî, Tirkmen, an Rojhilata Navîn an jinên cîhanê ne, şer kirine. Wan civaka siyasî û exlaqî weke yekane rê dîtine. Em ji bo vê dijîn, em ji bo wê têkoşîn bikin û ji bo wê şehîd bilevin jî, bêyî ku em tu gumanê jiyan bikin.

Fikir û felsefeya Neteweya Demokratîk ku ji aliyê Abdullah Ocalan ve weke diyariya azadiyê hatiye avakirin. Ev tov 50 sal berê li Kurdistanê, li Rojhilata Navîn û li seranserê cîhanê hatiye çandin. Îro li Rojava derfetek vebûye ku em ji faşîzma netewe dewletan rizgar bibin, çanda qirkirinê, çanda destavêtinê, çanda kirîn û firotinê bi dawî bikin. Em dibêjin em jin in, bêyî ku kesek destê xwe bide ser laşê min, bêyî ku ji zimanê min sûd werbigire, zayenda min a jinê ji holê rabike em hene. Me dît ku DAIŞê li Iraq û Sûriyê çi kiriye. Kombûna me ya îro çalakiyek e, çalakiyek pir demokratîk û xwezayî ye. Ev derfet beriya 10 sal tunebû. Jin bi jinan bawer nedikir, jin nedikarî bi jinan re bi hêsanî çalakiyan li dar bixista an xebat kiriba. Ji ber ku sîstema netewe dewletan, li ser navê netewbûnê, li ser navê olê, li ser navê çandan, ne tenê di mejî û ruhê me de, di aliyê fizîkî de jî perçebûneke tevahî çêkiribû.

Îdeolojiya xweparastinê ya hêzên YPJ'ê li ser bingeha hêza xwe ya demokratîk, wekhev û cewherî ye hate ava kirin. Ferq û cudabûnê nake, li gund û bajarên xwe dest bi birêxistinkirinê kirin, lê ji derveyî wê jî bi jinên Ereb, Suryanî, Asûrî û Keldanî xwe birêxistin kirin. Çek hilgirtin û çûn eniyên şer. Ji ber ku bêyî xweparastina rêxistinkirî civak nayê parastin. Û bêyî wê, berî her tiştî em nikarin jinan biparêzin.

Ger em îro li parzemînên vê dinyayê binêrin, wek mînak civaka Ewropayê, bêguman leheng û pêşengên xwe yên bidestxistina azadiyê hebûn, lê ev azadiya takekesî ye. Ger em li civakên parzemîna Afrîkayê û rewşa jinan binerin, em dibînin ku jin bê parastin in, erê, ew pir zana ne, şer dikin, bi her tiştî re ne razî ne, lê sîstema xwe digihîne hemû jinên vê parzemînê.

Îro em li jinên Rojhilata Navîn jî dinêrin, asta wan ne kêm e, di her warî de pêşengin, lê dema êrîş li ser civak û bedena wan hat kirin, weke koleyan hatin firotin. DAIŞ'ê gelek keç û jinên Kurd, Ereb, Ermenî û Suryanî weke dîl firotin û kirîn. Ev ne çîrokek e ku bi hezaran sal berê qewimî, lê di 10 salên dawî de. Ev ne bi dizî, li ber çavên raya giştî ya cîhanê pêk hat. Ji xeynî jinan, hin tevgerên demokratîk û femînîst ên li dijî vê derketin û çalakiyan li dar xistin, ti kesî behsa vê yekê nekir. Le we li cem jinên Bakur û Rojhilatê Sûriyê rawestiyan û YPJ'ê weke artêşa xwe dihesibînin. Îro em li Afganîstanê dibînin ku bi taybetî dayik, jin û keç ewqas tundiyê dibînin? Di sexsê wan de êşa ku ew dikişînin hemû civakê dikişîne.

Zihniyeta xweparastinê hê jî qels e. Parastin bi hezar salan ji mêran re hatiye hiştin. Û mêr, we dît ku li Şengalê di şexsê PDK û dewleta Iraqê de, dema ku DAIŞ hat, berî ku allahûekber begihêje guhên wan, bêyî ku li paş xwe binerin, ew, jin û civak li pey xwe hiştin û reviyan. 5 sal berê dema Reqqa û di dawiyê de Dêra Zor ji çeteyên DAIŞ'ê hatin rizgarkirin, jinên ku hatin rizgarkirin gotin, “Me bi hezaran caran mirinê xwest, lê dest me neket di destên van çeteyên kirêt.” Me ev hemû di wêne, vîdyo û fîlman de dît, niha jî em wan dibînin. Lê îro em bi metirsiyên hîn mezintir re rû bi rû ne, ji ber ku hîna îdeolojiya xweparastinê weke çandek hîn neketiyê li her mal û her civakê û ne bûye erka her jinê. Ji ber vê yekê planên li pişt deriyên girtî, bêyî ku mirovatiyê bipirsin, bêyî ku ji jinan bê pirsîn, her çiqas ji van biryaran herî zêde zirarê dibînin jî, plansaziyan têne kirin. Fikr û ramanên wan nayên temsîlkirin, lê yên tên kirîn û firotin, destavêtin û kuştinê ew in. Em îro dibînin ku li dewletên herî demokratîk jî rewşa jinan di rastiyê de çiqas xerab e. Ji ber vê yekê ez dixwazim li vir ne tenê di axaftina xwe de vê yekê bibêjim, bila dayikên me îro li vir rabin û biaxivin.

Bi hezaran keçên vî welatî di azadkirina bajaran li pey hev de fedekarî nîşan dane. Ev ji ber baweriya parastina hemû jinan pêk hat. Li vî welatî bi hezaran jinên ciwan bi aramî li goristanên şehîdan radizên, ji ber ku di wê baweriyê de bûn ku ev şoreş wê bi ser bikeve. Bi vê vê baweriyê derketin pêş. Ji bo hemû cîhanê û bi taybetî jî ji bo hemû jinan têkoşiyan. Ev forum bi tena serê xwe pir pîroz e, lê piştî wê erka me yê yekem û herî girîng di hemû malan de avakirina çanda xweparastinê be. Ser vî esasê Şoreşa Rojava, Bakur û Rojhilatê Sûriyê bala hemû cîhanê kişandiye ser xwe. Jinên enternasyonalîst ên ji hemû aliyên cîhanê tevlî vê şoreşê bûne, cihê xwe di nava vê şoreşê de girtine û ji bo wê jî şehîd bûne. Bi vê yekê em dibînin ku fikra ku şoreş hildigire belav bûye. Ji ber ku metirsiyên netew-dewletan hîn girantir bûne îro hêzên YPJ'ê bi dijwarî û berpirsyariyên mezintir re rû bi rû ne.

Ji roja yekem a şoreşê ev tişt ji me re dihat gotin: Mehek wê şoreş biqede, salek şûnde biqede, pêşerojeke dûr û dirêj nebe, baweriya wan tûne, kafir in. Bi vê sloganê êrîş kirin û kêliya me ya dawî ragihandin. Bi hezaran cenazeyên jinan li bazaran hatin firotin ji hevre wek diyarî hate dayin.

Lê ya ku di 10 salên dawî de li vir hatiye afirandin, divê bigihêje her civak, her netewe û her olê û nîşan bide ku di rastiyê de wekhevî, azadî, biratî bi rola pêşengiya jinê hatiye afirandin. Lê eger êrîş li laş û civaka wê were kirin, wê jin beriya her tiştî di asta herî jor de bi her rêbaz, taktîk û teknîkê şer bikin, serî natewînin, ji ber ku koletiya li ser jinê hatiye şikandin, êdî jin teslîmiyetê qebûl nake. li Bakurê Kurdistanê, li Başûrê Kurdistanê, li Rojava û li her derê cîhanê, jin tê hedef girtin lê teslîmiyetê qebûl nake. Bi hemû derfetên xwe xwe diparêzin. Ji ber vê yekê em gelekî kêfxweş in ku îro ev forûma ku hemû reng û dengên civaka Sûriyê tê de cih digirin, pêk tê. Jinên ji Rojhilata Navîn û cîhanê jî beşdar bûne. Em ji hemû cîhanê re dibêjin: Em êrîşî tu kesî nakin, lê ger hemû cîhan êrîşî me bike em ê heta dawî, heta nefesa dawî, heta dilopa xwîna xwe ya dawî li ber xwe bidin.

Em ê ji bilî xweparastinê tiştekî din qebûl nekin. Heta ku fermandar û şervanek hebe kes nikare vê şoreşê têk bibe. Ev qenaeta Sosîn Bîrhat, Tolhildan Raman, Şîlan Goyî û Sozdar Cûdî bû ku ji bo parastina gelê azad û civaka azad heta dawiyê di refên pêş de li ber xwe dan û xwe feda kirin. Da ku dayîk û keçên me di vê şoreşê de bi ewle bijîn.

Em ji bo hemû êrîşan amade ne. Ev ne tiştekî ku tenê tê gotin e. Îro em weke YPJ'ê deyndarê jinên Efrînê, Serêkaniyê û Girê Spî ne. Heta ku em van herêman azad nekin, penaber, dayik û keçan venegerînin, ne bi roj û ne jî bi şev em ê bi aramî razên. Yekane erka me wê dîsa rizgarkirina van herêman be. Da ku dayik û hemû jin bi cîranên xwe re dîsa bi hev re di nava aştiyê de bijîn. Ev dê bibe erk û exebatê me. Ez careke din vê forûmê silav dikim. Û bi rêzdarî şehîdên vê şoreşê silav dikim. Em rêya wan dişopînin.

Em wek YPJ soza xwe ya li pêşberî vê forûmê û hemû jinan nû dikin. Heya êrîş li ser jinan hebin em ê çeka xwe bi xwe re hilgirin. Gav bi gav, ber bi pêş em ê vê herêmê azad bikin, em soz didin dost û dijminên xwe. Bêguman ev şoreş wê ji bo jinên hemû cîhanê bibe rastî.

## Li Herêmên di bin Dagirkeriya Dewleta Tirk de Rewş û Berxwedana Jinan

Aynûr Paşa – Endamê Navenda Lêkolîn û Parastina Mafên Jinan

Şoreşa Rojava weke şoreşa jinê hate naskirin, ji ber ku jinan di wê de rola sereke û pêşeng lîst û di hemû astên siyasî, leşkerî, îdarî, dîplomasî û hiqûqî de cihekî girîng girt. Jinan di gelek beşên ku ji aliyê jinan ve hatine avakirin de cih girtin û hêza xwe nîşan dan û biryardariya xwe ya ji bo parastina şoreşê û destkeftiyên wê eşkere kirin.

Herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi taybet piştî têkçûna Dewleta Îslamî (DAIŞ) di nava aramî û ewlehiyê de bûn. Hebûna jinan di şerê li dijî DAIŞê de bûye sedema tirsê di nava refên DAIŞê de, ji ber ku jinan îsbat kir ku ew ji mirinê natirsin û heta dawiyê dê rûmeta xwe û welatê xwe biparêzin. Şehîd Arîn Mîrkan mînaka vê yekê ye.

Herêmên li Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi sedan, eger ne bi hezaran, hemwelatiyên Sûriyê ku ji herêmên din ji ber şer reviyane û berê xwer dan heremên me ji bo ewle û biîstiqrar bigerin, pêşwazi kirin. Şerê ku li dijî gel hate meşandin herêm vedigerand polîtîkayên serdema ku jin li sûka wek koleyan dihatin firotin û kirîn. Tirkiyê bi hevkariya komên radîkal û tundrew ên artêşa niştimanî ya Sûriyê bi armanca kontrolkirina beşên berfireh ji axa Sûriyê û pêkanîna plana xwe ya Osmaniyan li herêmê, şerê xwe yê newekhev bi şêweyê tundûtûjiyê li herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê dest pê kir. Dixwaze 30 km bi kûrahiya axa Sûriyeyê dagir bike û li gorî vê yekê dest bi êrîşa hewayî ya li ser bajarê Efrînê kir û piştî bombebaranê ew dagir kir. Bombebaran zêdeyî 55 rojan dewam kir. Armanca bombebaranê ew bû ku bi kuştina gel, çi sivîl û çi leşker, tirs di nav xelkê de belav bike da ku koçber bibin.

Piştî dagirkirina Efrînê dewleta dagirker û çeteyên wî, mîna Artêşa Niştimanî ya Sûriyeyê, her cure êrîşan li dijî şêniyan bi taybet jinan pêk anîn. Gelek jin hatin revandin, da ku fîdyeyê ji malbatên wan were xwestin. Di hevdîtina me de bi hin jin ên ji girtîgehên dagirkeran derketin jî me re belge kirin ku rastî îşkenceya fizîkî û derûnî hatine û hin ji wan jî piştrast kirin ku zêdetirî carekê ji aliyê çend endaman ve rastî destavêtin û destdirêjiyê hatine.

Her wiha jin û zarokan direvînin bi armanca firotin û bazirganiya organên wan an jî ji bo fuhûşê de kar bînin. Rêxistina mafên mirovan li Efrînê herwiha tekez kir, ku piraniya malbatan neçar in ku keçên xwe yên temen biçûk bizewicînin, ji bo ku wan bi çeteyên li Efrînê re nezewicînin.

Yek ji endamên artêşa niştimanî ku piştre hat girtin jî ev tişt piştrast kir: “Eger me keçeke bedew di malekê de bidîta, me dora malê girtibû û bi zorê dibirin, eger malbata wê red dikir ku wê bide me, jin zewicî ba an na”. Jinên ku rastî şîdeta zayendî tên gelek caran ji ber şerm û tirsê qala wê nakin.

Piştre jî herêmên Girê Spî û Serêkaniyê bûn hedefa dewleta dagirker û li wir jî heman polîtîkaya êrîşên sîstematîk ên bi balafiran bombebaran kirin, bêyî ku cudahiyê bike navbera herêmên sivîl û leşkerî. Xelkê wê derê jî neçar man malên xwe biterikînin û koçî herêmên din ên Bakur û Ro-

jhilatê Sûriyê bibin. Gelek hîn jî di kampan de dijîn û neçar man şert û mercên jiyanê yên dijwar qebûl bikin.

Û polîtîkaya sîstematîk a dagirkeran a li dijî jinan di hemû qadan de yek e, ku kuştin, girtin, destavêtin û fuhûşê di nava şêniyên kampê de bi armanca lawazkirina îradeya jinan tê meşandin. Hejmara kesên ku ji ber artêşa Tirk a dagirker û çeteyên wê ji Efrîn û Serêkaniyê û Girê Spî û derdora wê 600 hezar e.

Piraniya wan ji gelê Kurd in û ji sedî şêst ji wan jin û zarok in ku jiyana xwe ji dest dane û bi hezaran jî birîndar bûne. Komîsyona Lêpirsînê ya Navdewletî ji bo Sûriyê 70 haletên destavêtinê li ser jin û keçan li Efrînê û 30 haletên destavêtinê li Serêkaniyê belgeh kirine, ji bilî bi sedan jinên ku di zindanên çeteyan de girtî ne, ku rastî xirabtirîn şêweyên îşkencekirin û binpêkirina mirovî û hurmetî tên.

Statîstîkên li ser tawanên li dijî jinan li herêmên dagirkirî de gelek in, lê Navenda me ya Lêkolîn û Parastina Mafên Jinan ev hejmar tomar kiriye: Di navbera 2018-2022’an de 118 jin hatine kuştin, 216 jin hatine revandin û 212 jin jî birîndar bûne. Her wiha 117 zarok hatin kuştin, 64 hatin revandin û 252 jî birîndar bûn.

Ji vê yekê em digihîjin encamê ku dewleta dagirker hewl dide îradeya jinên Bakur û Rojhilatê Sûriyê ku ji bo hemû jinên cîhanê re bûne mînak bişkîne û serkeftinên jinan tune bike, ji bo wê jî li herêmên dagirkirî sûcên li dijî mirovahiyê pêk aniye û hîna jî dike.

Ji ber vê yekê divê em raya giştî ya cîhanê li dijî vê dagirkeriyê seferber bikin da ku dawî lê were. Divê jin û zarok karibin vegerin malên xwe, li hemû herêmên dagirkirî piştgirî û alîkarî ji gel re bê kirin da ku heremê ji nû ve ava bikin û gel dikaribe li ser axa xwe bi ewlehî û aramî bijî.

## Êrîşên Siyasî, Aborî, Civakî û Bîrdozî Li Dijî Şoreşa Jin û Berxwedaniya Jinan Ji Bo Parastina Hebûn û Destkeftiyên Xwe

Zayide - Endama Akademiya Jineolojî ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê

Destkeftiyên ku di nava Şoreşa Rojava deh salan de hatine bidest xistin li seranserî cîhanê dengvedan. Bi taybet gihandina pergaleke xwerêveberinê û xweparastinê li ser hîmên paradigmaya civaka demokratîk, ekolojik û azadîxwaza jinê û pêşengtiya jinan di parastin û avakirina şoreşê de hiştine ku di destpêka sedsala 21'an de hêviyên jiyana azad û şoreşê di nav civak, tevgerên azadîxwaz, jinên Kurdistanê û cîhanê de ji nû ve zindî bibin û belav bibin. Beramberî vê yeke hêzên desthilatdar ketine gumanê. Lewma çiqas nakokiyên navbera hêzên hegemon û dewletên herêmî wekî navbera Suriyê û Tirkiyê di şerê cîhanê 3'yem de xuya dibin jî, di gelek êrîş û polîtîkayên li hemberî pêşketin, pergalbûyîn û berdewamiya şoreşa jinê de ew digihînin hev. Ji ber vê yeke heta roja îro gefên dagirkerî, qirkirinên fîzîkî, siyasî û çandî li ser jin û gelên Bakûr û Rojhilatê Sûriyê bi dijwarî berdewam dikin. Wekî Akademiya Jineolojî ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê em dixwazin bi mijar û nîqaşên Konferansa Yekemîn a Şoreşa Jinê ya Bakur û Rojhilatê Suriyê ve girêdayî bal bikişînin li ser êrîşên siyasî, aborî, civakî û îdeolojîk, yên li hemberî destkeftiyên şoreşa jinê û gelên Rojava hatine pêşxistin. Van êrîşan rojane di nav hevdu de bi şêwazên cûr bi cûr tên meşandin. Lê em girîng dibînin armanc û rêbazên van êrîşan yek bi yek eşkere bikin û bigihînin tehlîlên hevbeş da ku em bikarin siyaset û rêbazên berxwedaniya jinê ji bo parastin û serkeftina şoreşê rast diyar bikin.

Êrîşên civakî yên li ser şoreşa jinê
Ji sala 2011'an ve di rewşa jin û civaka Rojava de guhertinên mezin û bi lez çêbûne. Lêkolîna sosyolojîk li ser asta Bakur û Rojhilatê Sûriyê ya Akademiya Jineolojî derxistiye holê ku piraniya jinan bi pêvajoya şoreşê re hêz û mafên xwe bêhtir naskirine. Beşdarbûn û birêveberina jinê di qadên civakî, aborî, polîtîk û leşkerî de bûye çavkaniya xwebaweriyê û nasnameya nû ya jinên Rojava. Bi avakirina sazî û meclîsên jinê, bipêşxistina qanûnên ji bo parastina mafê jinan û rûnişkandina pergala hevserokatiyê re pêşketinên girîng di warê naskirina nêrîn û vîna jinê de çêbûne. Bi ser de jî perwerde û xebatên bi armanca derbaskirina zihnîyeta baviksalar û zayendperestiya civakî ve girêdayî hatine meşandin. Vê yeke heta astek guhertinên erênî di têkiliyên malbatî de bi xwe re aniye. Lê belê dîsa feraseta baviksalar a ku jinê wekî 'şeref û milka zilamê' dinirxîne hê jî xwe ferz dike û êrîşên zayendperest ên li ser jinan berdewam dikin.

Nîqaşên civakî û bilançoyên Mala Jin, Asayîşa Jin û Dada Jinê didin xûyankirin ku bûyerên gelek bi êş wekî kuştin û xwekuştinên jinan; tundiya fîzîkî, zayendî û derûnî li dijî jinê hê jî diqewmin. Gelek kiryarên maf û azadiya jinan binpêdikin ji aliyê 'Rêgezên Bingehîn û Ferweriyên Giştî yên Jinê' yên xweseriya demokratîk ve di sala 2014'an de hatine mahkum kirin. Lê belê dîsa beşeke van kiryaran di civakê de tên domandin. Bi taybet gelek kes di çarçoveya nêrînên baviksalar de şêwazên zewacê wekî zewicandina jinên bi temenê piçûk an jî pirjinî diparêzin. Di bin şertên şer, alozî û koçberiyê yên 11 salên dawî li Sûriyê de meyla malbatan a zû zewicandina keçan careke din zêdetir bû. Gelek malbat vî rewşê bi hinceta 'stirandina kecan' îzah dikin. Her wiha bandora

têgîhin û teqalîdên olperest û yên Îslama siyasî jî di van meylan de dîyar dibe. Hewldanên zû zewicandina jinên ciwan, dîlgirtina jinan wekî amûrên zarokanînê û xizmetkarên malê, qedexekirina tevgerandina jinan di bin ferasetên 'ayib' û 'haram' de careke din tê teşwiq kirin da ku li pêşiya xwendin, pêşketin û lêgerînên jiyan û azadiyê yên jinên ciwan were girtin.
Di aliyê din de jî êrîşên zayendperest bi rêya teknolojî û çanda moderniteya kapîtalîst jiyana ferd û civakê bi bandor dikin. Bi vî awayî jin û civakê ji çand û nirxên xwe yên komînal tên dûrxistin. Li şûna vê teqlîdkirin, madîyat û ezezîtiya lîberalîzmê û moderniteya kapîtalîst wekî pêşketin tên pêşkeş kirin. Bi vî rengî nêzîkatiyên zayendperest ên ku jinan wekî amûreke ya sekse û zewk standina zilamê dinirxînin di nav civaka Bakur û Rojhilatê Sûriyê de jî tên pêşxistin. Di bin tesîra van nêzîkatiyan de ruxmê xizanî, şer û ambargo sektorên moda û 'emaliyatên xweşikbûnê' belav dibin û qezencên zêde dikin. Herwiha wekî encama heman siyasetên zayendperest û kapîtalîst yên li ser bedena jinê, bêyî ku sedemeke tendirustî hebe zarokanînê bi rêya emaliyatan tê teşwîq kirin.

Her çiqas van herdu meylan berovajiyê hev xuya dikin jî, divê em hem xurtkirina zayendperestiya civakî di milê kevnperestî û olperestiyê de hem jî belavkirina zayendperestiya civakî ya moderniteya kapîtalîst wekî êrîşên xwedî heman armancê binirxînin û li hemberî van herduyan têkoşîna xwe bilind bikin. Ji ber herdu şêwazên êrîşê dîlgîrtina jiyan û vîna jinê, têkbirina şoreşa jinê armanc dikin. Li hemberî parçekirin û milkkirina jinê pêwîst e, em rih û têkoşîna xwe ya hevbeş a jinan ji bo parastina şoreşê û gihandina azadiya civakê xurttir bikin. Êş û hawara her bûyera tundiya li dijî jinê dibe bangewaziya rast fêhmkirin û tahlîl kirina sedemên vê bûyerê û bilind kirina têkoşînê. Her êrîş û neheqiyê ku li dijî jinek pêk tê, gef li jiyan û azadiya me û ya tevahiya jinan dixwe. Bi vê têgihînê ve em perwerde, nîqaş û çalakiyên ji bo bi hêzkirina vîn, bîrewerî, rêxistinbûyîn, hevkarî û xweparastina jinan ji erkên xwe yên serekî dihesibînin. Her wiha em dixwazin helwest û hewldanên hevbeş ên jin û mêr, ciwan, kal û pîran – bi kurtasî yên beşên civakê hemuyan - di vê mijarê de pêşbixin da ku em bikarin di sala 11'an a şoreşê de êrîşên fîzîkî û zêhnî li dijî jinê bi dawî bikin û têkiliyên rêzdar, bi hezkirin di nav hevjîn, malbat û civakê de pêşve bibin.

Êrîşên ideolojîk ên li dijî şoreşa jinê
Êrîşên siyasî, aborî û civakî li ser jinê di cewherê xwe de êrîşên bîrdozî ne. Herçiqasî piraniya êrîşên bîrdozî bi rêbazên zirav tên meşandin, gefên herî mezin li tevahiya qadên jiyanê, civak û şoreşê dixwin. Ji xwe di dîrokê de bingeha pergalên baviksalar û desthilatdar bi êrîşên bîrdozî li hemberî baweriya xwezaya zindî û dilovaniyê ya civaka dayika xwedawend ve hatiye avêtin. 5000 sal in zilam, resmalî û dewletê bi rêya vegotinên mîtolojîk, olî, felsefî ve û di dawî de bi nirxandinên qaşo zanistî ve desthilatdariya xwe înşa kirine û wekî rewa destnîşan kirine. Van êrîşên bîrdozî yên ku bi hezaran salan hatine meşandin bûne sedema qirkirinên sîstematîk li ser jin û civakê. Tevahiya îdeolojiyên desthilatdar xwe dispêrin înşaya têgihîna zilamê serdest û jina kolê. Li ser vê esasê, mirov û civakê hatine parçekirin û ferasetên zayendperest, olperest, nijadperest û çînayetî hatin afirandin.

Beramberî van bîrdoziyên desthilatdar, Rêber Abdullah Ocalan fikrên azadiya jinê û rizgariya

civakê pêşxistiye. Felsefe û bîrdoziya Rêber Abdullah Ocalan a ku di têgînên wekî bîrdoziya rizgariya jinê, sosyalîzma demokratîk, konfederalîzma demokratîk, netewa demokratîk û hevjiyana azad de bi pergal bûye, di heman demê de bingeha Şoreşa Rojava û şoreşa jinê amadekiriye. Nexşeya rê, armanc û projeya şoreşê bi hêza vê bîrdoziyê re zelal bûne û ketine meriyetê. Yê ku pergala desthilatdara dewletê û resmalî herî zêde hejand û jê tirsiya, hêza bîrdozî ya şoreşê ye, yê ku di heman demê de bandora xwe li ser jin û gelên azadîxwaz li herêmên din ên Rojhilata Navîn û cîhanê kiriye. Ji bo tepîsandina hêviyên azadiyê, hêzên desthilatdar giraniya xwe herî zêde dane êrîşên îdeolojîk li dijî jin û şoreşê. Êrîşên bîrdozî hem bi rêbazên 'nerm' wekî şerên piskolojîk û sîyasî, propagandayên reş, malumatên şaş û fitne fesadî tên meşandin, hem jî bi rêbazên hişk wekî tundî û qirkirinan. Lê armanca van hemuyan şikandina vîn, nasname û hêza polîtîk a jinan û civakê ye.

Jixwe, ji ber ku hêzên hegemon ên pergala resmalî hîna beriya 24 salan bîrdoziya Rêber APO wekî xeteriyê ji bo berjewendiyên xwe dîtine, komploya navnetewî pêk hat. Em dikarin dîlgirtina Rêber APO û xistina PKKê ya lîsteya terror wekî beşên êrîşên bîrdozî binirxînin. Ji ber armanceke serekî ya van emaliyatan li pêşiya girtina belavbûn û jiyanî kirina bîrdoziya azadiyê bû. Pergala desthilatdar bi êrîşên nû yên bîrdozî û qirkirinan li dijî jinan bersiva xwe da perspektîfên Rêber APO di warî nirxandina sedsala 21'an wekî sedsala şoreşa azadiya jinê û hîmên bîrdoziya rizgariya jinê de. Hîma welatparêziyê bi gur kirina nijadperestiyê, oryantalîzm û bişavtinê hatiye lêvegerandin. Li hemberî hîma fikrê azad û vîna azad a jinê hêzên hegemon di milekî de ji nû ve olperestî, çanda îteat kirin û ezberkirin li ser jinê ferzkirine, di milê din de jî bi rêya teknolojî û medyayên dîjîtal fikrê mirovan her diçe belavdikin û heqîqatê diçewisînin. Li şûna hîma rêxistinbûyînê, ferdperestiyê qaşo wekî azadî tê teşwîq kirin. Bersiva hîma têkoşînê bi qederperestî û dana bawerkirinê ku 'tu alternatîf tune' û 'tiştek nayê guhertin' hatiye dayîn. Beramberî hîma exlaq û xweşikbûyîna jinê ya cewherî, bê watekirina jiyanê, ferman û qalibên sinaî ya modayê li ser şiklê bedenê, şêwazê lixwekirina cilan û hwd. di asta herî jor de li ser jinan tên ferz kirin.

Di rastî û bîrdoziya rêxistina faşîst a olperest a DAIŞê de lutkeya êrîşên bîrdozî, siyasî, aborî û civakî li dijî jin û şoreşê eşkere dibin. Hêzên hegemon di pêşxistina bîrdoziya Îslama siyasî û avakirina rêxistinên olperest wekî El Qaydê, DAIŞ, El Nusra û hwd. de bi xwe cih girtine da ku di serdema qeyrana pergala resmalî û Şerê Cîhanê 3'yemîn de bipêşketina fikrên azadîxwaz, pêngavên şoreşa jinê û xwerêveberina civakê têk bibin. Bi vî awayî em dikarin avabûna DAIŞê wekî înşa kirina fikrekî dij-şoreşê û amûrekî qirkirina jinê binirxînin.

Qaşo di bin nave islamiyetê de, DAIŞ îdeolojiya xwe ya olperest û zayendperest bikartîne da ku bi şûr û serjêkirinê, qirkirinên fîzîkî, fikrî û çandî li ser jin û gelan bimeşîne. Armanca fikir û kiriyarên wan belavkirina tirs, tunekirin û teslîmgirtina damarên berxweder û resen ên jin û civakê ye. Ji ber Kurdên Êzdî bi bawerî û çanda xwe ya resen ve girêdayî, jiyan û nirxên civaka exlaqî û polîtîk bi hezaran salan parastine, gelê Êzdî bi taybet wekî hedefa komkujî û qirkirinên DAIŞê hatiye hilbijartin. Di fermana 73'yan li ser gelê Êzdî de qirkirineke taybet li dijî jinên Êzdî hatiye lidarxistin. Bi kuştin, tecavûz, êşkence, firotin, kolekirin û bişavtina jinên Êzdî ve, DAIŞ tunekirina vîn, nasname û hebûna civaka Êzdî bi tevahî kir armanc. Di heman demê de wan bawer kirine

ku bi şikandina jinên Êzdî ew ê bikarin hêza jiyanê û berxwedana jinê jî ji holê rabikin. Kiryarên hovane yên DAIŞê bi taybet di kesayetên jin û zarokên ku hatine revandin û dîl girtin de tirs û trawmayên kûr avakirine. Rêbazên qirkirina çandî, bişavtinê bi darê zorê û tundiya bîrdozî bûn sedemên ku gelek jin û zarokên Êzdî li bin esareta DAIŞê zimanê xwe, nasname, çand û ola xwe înkar bikin heta ji bîr bikin. Gelek ji van hîna piştî ji destê DAIŞê hatine rizgarkirin êş û xofên vê yeke dijîn.

Lê belê, yek ji rûndanên herî trajîk jî ew ê ku DAIŞ bi bîrdoziya xwe ya dijberî jinê hejmareke mezin a jinan jî kişandin nava refên xwe. Di hişmendî û pergala DAIŞê de jin hem weke cariyên ku ji zilaman re xizmet bikin, ji bo zêdbûna leşker û xizmetkarên zarokan tên bikar anîn, hem jî wekî armûrên bazirganiyê yên ku tên kirîn û firotin. Her wiha DAIŞ di propagandayên xwe de ferdperestî, karesatên xwezayî û civakî, rizandina bawerî û exlaqê wekî encamên kahfirtiya moderniteya kapîtalîst û femînîzmê rexne dikin. Li hemberî vê yeke wan wekî çareseriyê qaşo manewiyata civakbûnê ya di dewleta islamê de û jiyana bihuştê piştî mirinê pêşkeş dikin.

Bi bandora van propagandayan beşek jinan jî ketin xefikên DAIŞê, yên ku çareseriyê ji zext, qeyran û bêwatebûyîna jiyana modernite lêgeriyan. Wan bawerkirine ku vegera li ser ola qaşo ‘rastekîn’ rêya yekane ya xilasiyê ye. Îdeolojiya DAIŞê ‘îslama rastekîn’ jî wekî stûxwarkirina jinê û îteatkirina wê ya teqez a hemû fermanên xwedê di kesayeta zilam û dewleta îslamî de şirove dike. Lewma feraseta Daişê rewa dibîne li hemberî hertişt û herkesî/ê ku ne li gorî qanûnên wan be, cezayên tund heta recm û serjêkirinê pêkbîne. Li ser esasê vê bîrdoziyê, Daiş him bi rêya medyayên dîjîtal him jî bi şaneyên xwe li gelek welatên cîhanê û bi taybet jî li herêmên xistibû li bin serweriya xwe, bi sed hezaran jin, zilam û zarokan wekî leşker û kujeran bi perwerde kirine.

Beşeke jinan jî ji ber derfetên madî yên ku DAIŞê li herêmên dagirkirî ji endam û alîgirên wan re belav kiriye, xwe nêzîkî wan kirine. Di nav wan jinan de bi taybet kesên ji welatên Asyayê hene, yên wekî mêtingehên sermaya navdewletî tên bikaranîn. Jin û gelên wan welatan ji ber siyasetên talan û kedxwariyê bi xizanî û birçîbûnê re têkoşîn dikin. Tevî bandora propagandayên olperest, wan jinan çareseriya pirsgirêkên xwe yên aborî jî di nav rêxistina talanker de lêgeriyan. Lê belê wan neketina ferqê ku DAIŞê di rastiya xwe de bi xwe amûreke desthilatdarî û kedxwariya pergala kapîtalîst e.

Jinên yên rastiya DAIŞê naskirine û poşman bûne jî, gelek car ji ber tirs û gefên kuştinê newerin jê veqetînin. Ev rewşa xeternak herî zêde li cihên wekî li qampa Holê diyar dibe. Tenê navbera meha Çileya 2021 û Hezîrana 2022’an 106 bûyerên kuştina kesan yên li dijî şanên DAIŞê li qampê rûdane. Piraniya van kuştiyan jî jin in. Ji ber tirsa kuştinê û zilmê, hê jî hin jinên Êzdî yên ku hatine revandin û kolekirin, newerin xwe eşkere bikin. Her wiha hin ji wan jinên Ezdî yên ku rastî zordestî û tecawizên çeteyên DAIŞê hatine û zarokanîne ji ber gumana ku di civaka xwe de nayên qebûlkirin hîna wekî dîlgirtiyên îdeolojiya DAIŞê dijîn.

Wek encam em dikarin bibêjin ku êrîşên DAIŞê yên ku heta roja îro bi alîkariyên leşkerî, aborî, siyasî û bîrdozî ya gelek hêzên sermayedar û dewletan - di serî de yên dewleta Tirk - pêk tên, tunekirina hêviyên jiyana azad a jinan û gelan armanc dikin. Gefên şerekî nû ya dagirkerî yên Erdogan li dijî herêmên Reveberiya Xweser xwedî heman zêhniyet û armanc in.

Lê danehev û destkeftiyên 10 salên şoreş û berxwedana Rojava ji me re destnîşan dikin ku bipêşxistina fikir û rêxistinbûyîna li ser hîmên bîrdoziya rizgariya jinê, rihê netewa demokratîk û hevjiyana azad çeka me ya herî xurt e. Girîng ew e ku em pîvan, fikir û helwestên xwe yên hevbeş ji bo parastin û pêşveçûyîna şoreşa jin û civakê di her kêliya jiyanê de bi zelalî diyar bikin. Di vê wateyê de em bawerin ku jinên Bakur û Rojhilatê Suriyê bi riheke hevbeş, bi têkoşîn û rêxistinbûyînên hevbeş wê bikarin êrîşên ideolojî, siyasî, civakî û aborî lidijî şoreşa jinê vala derbixin û di salên pêşiya me de jî bibin hêza pêşeng a berxwedan û çareseriyê.

Lewma em dibêjin; bi hêza 19'ê Tirmehê em ê agirê şoreşa jinê bilind bikin – hebûna xwe biparêzin û azadiya xwe avabikin!

Salvegera 10'ê mîn a Şoreşa Rojava Li Hemû Gelan û Jinên Cîhanê Pîroz be!

## Bandora Şoreşê li ser Têkoşîna Jinên Sûriyan

Îlham Metlî - Yekîtiya Jinên Suryanî

Îro nûnerên me yên komên cuda tevlî panelê dibin. Em ê bi jinên Suryanî ku ez dikarim weke nasnameya kolektîf bi nav bikim dest pê bikin. Ev yekemîn foruma şoreşa jinê ya li Bakur û Rojhilatê Sûriyê ye. Bi hevgirtina jinan em ê destkeftiyên şoreşê biparêzin û geş bikin.

Di dirêjahiya dîrokê de jinan di ji nû ve avakirina civakê de, hem di serdema kevnar de, hem jî di serdema nû de, roleke sereke û bingehîn lîstiye. Jin her tim di pêkanîna dan û standin û têkiliyên civakî de xwedî roleke sereke ye. Lê pergala desthilatdar a baviksalarî û qanûnên nedadmend jin ji pozîsyona xwe ya pêşeng dûr xistine. Ji ber hikûmetên dîktatorî û desthilatdariya baviksalarî, jin di bin giraniya berjewendiyên civaka çînî de hatiye pelçiqandin. Bi vê yekê re, bi demê re jin ji aliyê fizîkî, rûhî û hizrî ve ji hemû aliyên pêşketin û pêşketinê hatin qutkirin.

Di aloziya Sûriyeyê de yên ku herî zêde berdel dan û rastî binpêkirinên herî hovane tên, jin in. Jinên koçber bûn, zarokên xwe weke şehîdên xaka Sûriyê pêşkêş kirin. Ev êş encama tiştên ku li Sûriyê qewimîn bû û pirsgirêkên civakî, çandî, aborî û siyasî li ser civakê bi giştî û jinan bi taybetî girantir kirin.

Bi van şert û mercan re trajediyek nû li gel kevneşopî, urf û qedexeyên kevnar ên li ser jinan, dibin sedema karesat û binpêkirinên dramatîk û tirsnak ku bandorê li hemû gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê û gelê Sûriyê bi giştî dike pêk hat. Jin mexdûrên yekem ên polîtîkayên baviksalarî û rejîmên zalim in.

Di encama vê şoreşê de pêwîst bû jinek xwedî îradeya azad ku bi tena serê xwe pirsgirêkan çareser bike û dozên jinan bi xwe biparêze û li hemberî hemû kêşe û zehmetiyên ku rastî wê tên derkeve, ji bo parastina mafên xwe mekanîzmayeke nû ya parastinê pêşbixin. Em amaj dikin ku herêma Bakur Rojhilatê Sûriyê herêmeke civakî ya mozaîk e ku tê de pêkhate, netew, etnîsîte û mezhebên cuda hene ku bi awayekî aşîtyane, dostane û mirovî bi hevre dijîn, bi adet û urfên mîna hev. Ji ber vê yekê em dibînin ku jina Suryanî ne dûrî jina kurd û jina ereb û jinên din ên vê erdnîgariyê ne.

Yekitiya Jinên Suryan ji bo xurtkirina jina Suryanî-Asûrî-Kildanî bû kevirê bingehîn ji bo avakirina civak ê. Ta ku kesayeta xwe avabike û hişmendiya wê xurtbike ji bo şikandina dorpêça li dora jinê di nava malbatê de û ji bo pêşxistina wê têkoşînê dimeşînê.

Jina Suryanî beriya şoreşê xwişk, dayik, hevjîn û hevala bû ku ji perwerdehiya zarokên xwe re mijûl dibû, berpirsyariya mal û aboriya wê dikir, ji bo piştgiriya aborî ya malbatê û bilindkirina asta jiyanê dixebitî. Li gel kur û keçên xwe û hin jinên din, wê ji wesfên rêberiya giyanî yên herî bilind cihê xwe digirt. Her wiha jinên Suryanî ji bo ku çanda xwe ya dîrokî û şaristaniya xwe derxînin ber çavê xwe yê derûnî eleqedar bûn. Lê piştî şoreşê nêrîna jina Suryanî bi tevahî guherî, helwest û têgihîştina wê ya jiyana nû guherî, xwe nas kir û cewherê xwe yê rast derxist holê û di hemû qadan de, di warê siyasî û leşkerî de cih girt.

Jina Suryanî, neviya Îştar, Zenobiya û Şamîram, karîbû urf û edetên kevneşop derbas bike, tirsê bişkîne, bi wêrekî bixebite û beşdarê jiyana giştî bibe. Arastîn û feraseta wê ya jiyana nû guherî, xwe dît û cewhera xwe ya rast derxist holê. Di warê çandî, leşkerî û siyasî de di hemû qadan de cih girt. Di Rêveberiya Xweser a Bakur  Rojhilatê Sûriyê de nûnertiya gelê xwe yê Suryanî, Asûrî-Kildanî kir û weke hevserok, cîgir û rêveber di cihên biryardanê de rola xwe ya pêşeng lîst. Ji bo parastina mafên gelê xwe û gelên herêmê di forum û konferansên siyasî yên navneteweyî de nûnertiya gelê xwe kir. Ji bo avakirina civakeke demokratîk, azad, dadmend û ewle bû mînaka azadiyê, ji ber dizanî ku azadiya gelan bi azadiya jinê pêkan e. bi têkoşîna xwe gelek destkeftin li Bakurê Rojhilatê Sûriyê bi dest xist û di nivîsandina hevpeymana civakî ya ji bo Rêveberiya Xweser de rol list.

Ruxmî hemû astengiyên civakê li hember hilgirtina çekan, wê hemû astengiyan derbas kir û li ser çawaniya bikaranîna çekan ji bo parastina gelê xwe û gelên herêmê dersên perwerdeyê dît. Li vê erdingariyê jina Suryanî di warê parastin û ewlehiyê de gelek destkeftî bi dest xistine, mina Yekîneyên Parastina Jinê ya Beth Nehreyn, YPJ û Jinên Sotoro (Hêzên Ewlekariya Hundirîn) hatin avakirin. Ev yekîne bi serkeftinên meydanî bûn sembola wêrekî û qehremaniyê. Bê tirs çek hildan li dijî rêxistina terorîst a herî bi hêz bi nûnertiya DAIŞ, Cebhet El-Nusra, Artêşa Azad û komên din ên mîna wê di gelek operasyona de (El-Reqa - Dêr El-Zor - Til Temir), ji bo parastina xaka xwe, gelê xwe û gelên herêmê di refên herî pêş de cih girt û têkoşîna xwe berdewam kir. Ji ber dizanî wê bi avakirina civaka azad a demokratîk daxwazên xwe pêk bîne û bi têkoşîna xwe bibe mînak û ji hemû cîhanê re îsbat kir ku ew dikare welatê xwe biparêze û li kêleka mêran şer bike û bi hevalên xwe yên din ên  Kurd, Ereb û Çeçen û hêzên ewlekariya navxweyî re beşdar bibe. Hêzên jin di Sûtoro û di parastina ewlekariya herêmê de xwedî roleke mezin bûn.

Di dawî de dem hatiye ku em hevgirtina xwe ya dersînor bi jinên cîhanê re, ya ku bi hêz û vîna jinan bawer dike re ragihînin. Sedsala bîst û yekê wê bibe sedsala têkoşîna jinê. Jin dengê bilind yê civakê ye û têkoşîna wekheviya zayendiyê ye.

## Bandora Şoreşê li ser Têkoşîna Jinên Ereb

Nesrîn El Hesen - Endamê Kombuna Jinên Zenûbya

Rojhilata Navîn ji destpêka dîrokê ve bûye dergûşa şaristaniyên mirovahiyê, xwedî erdnîgariyek girîng û cihê ku şaristaniyên kevnar lê hatiye afrandin e, Rojhilata Navîn di warê stratejîk, aborî, siyasî, çandî û olî de herêmek naskiriye. Jina ku dest bi afirandina dîroka xwe kir û li ser vê erdnîgariyê ji xwe re hebûnek ava kir û bi keşfên xwe jiyana xwe bi spehî zêde kir û ji bo afirandina şêwazê jiyanê yê li ser bingeha azadiyê xebitî. Jin li Rojhilata Navîn di hemû aliyên siyasî, civakî û rêxistinî de di civakê de roleke girîng û pêşeng lîstiye û motora sereke û stûna bingehîn a guhertinên Rojhilata Navîn e, ku destkeftiyên mezin bi dest xistine û destkeftiyên mezin ava kirine. zemîna pêşketina di nava civakê de avakir û bi awayekî xwezayî bandoreke mezin li ser jinên hemû cîhanê jî kir.

Bi derbasbûna demê re nasnameya jinê ji aliyê zîhniyeta zilam ve hate çewisandin û biçûkxistin û di dîroka mirovahiyê de yekemîn mexlûq e ku di bin koletiyê de ye. Heta roja îro koletiya jin di hemû pergalên baviksalarî de didome. Dizanin ku tasfiyekirina jinan û kuştina wan ji aliyê giyanî û manewî ve wê parastina desthilatdariya wan misoger bike.

Û li herêmên din ên cîhanê ev rewş di qonaxên cudaxwaziyê yên dîrokî re derbas bûye, bûye sedema astengkirina jinan û bêparkirina wan ji maf û azadiya wan, hin ji van astengiyan li ser bingeha baweriyên olî bûn, lê gelek jî ji ber pergala baviksalar û her wiha ji adet û kevneşopiyên biyanî yên civaka me ji baweriyên olî zêdetir in.  Hîna jî hin herêmên ereban jinan ji bi karanîna mafên wan yên mirovî yên herî bingehîn, wek mafê xwendinê, zewaca temenê biçûk, pirzewacî, bêparkirina mîrasê bêpar dihêlin û yasayên destûrî yên ku mafên rewa yên jinan destnîşan dikin qebûl nake, û wek em dibînin yasayek ku jinan ji tundî û kuştinê biparêze bi bihaneya namûsê û argumana civaka eşîrî nayê pêkanîn.

Eger em behsa êş û azarên jinên Sûriyê bikin, nemaze bi hatina DAIŞê re, ku hemû diyardeyên sivîl, civakî û çandî bi ferzkirina pakêtek ji yasayên tund û astengên li pêşiya jinan ji holê rakir, ew rastî hemû rêbazan hatin. cureyên îşkenceya sîstematîk, destdirêjiya fizîkî, destdirêjiya cinsî û firotina wan di sûka koleyan de, û bûn qurbaniyên sucê kuştin û destavêtin. hemû binpêkirin rêbazên hovane û sucên şerin ji bo berovajîkirina wêneya rastî ya jina têkoşer û bidawîkirina jiyana û dîrok wê.

Tevî van hemû zehmetiyên ku jinên Ereb li Rojhilata Navîn rû bi rû wê mane jî, li hemberî hemû rejîmên desthilatdar, mêtinger, bi hemû israr û îradeya xwe ji bo avakirina nasnameya jinê ya rastîn li berxwe didan û têkoşîn dikirin. Di kêşeyên ku wan pêşkêş kirine de modelên me jî hene ku em ser şopa wan bin. Ji ber di dirêjahiya dîrokê de îspata hebûna wan heye. Mîna Qirala Çolê Zenobiya,  ew yek ji karakterên jin ên mezin e ku di dîrokê de destanên qehremaniyê yên herî xweş nivîsandiye, û heya roja îro ew mînaka  îradeya azad e ku mirov dikare bişopîne. Bi aqil, hiş û stratejiya xwe ya leşkerî û siyasî navdar bu. Bi hilhatina tava azadî, biratî û jiyana hevbeş re tevgera xwe ji nû ve bi dest xist.

Her wiha yek ji têkoşerên jin ên mezin şehîd Sena Muhêdelî, xwedî ruhê welatparêziyê ku bi hezkirina xwe ya ji bo welatê xwe ayetên herî bilind ên şehadetê hilgirtiye. Yek ji edebiyat û helbestvan û pêşengên wêjeya erebî nivîskar Mey Ziyadê ye ku di çend zimanan pispor bûye û ev jî nîşan dide ku bi çandên din re buye yek. gotar, lêkolîn, wêne, rojname û kovar weşandine û roleke wê ya mezin hebû di parastina mafên jinan de. Ew di dîroka edebiyata femînîst a ereb de yek ji pêşeng û ronesansa edebî ya navdar e. Û Fatima El-Fihrî ya ku yekemîn zanîngeh li rojhilata navîn ava kir, û zanîngeh xwedî roleke mezin bû di derçûna zanyarên payabilind de, û ew evîndara zanistê ye, bi taybetî ji bo jinan. Di nava jinên ku beşdarî şer bûne Xewla Bint El-Ezwar û Nisêba El Mezîniya bûn û hejmareke zêde ya jinan di hemû qadên civakî, rêxistinî, leşkerî, aborî û zanistî de beşdar bûn. Weke ku em di dîrokê de jî dibînin, jina Ereb tevî hemû zehmetiyan jî. dest ji rola xwe ya di nava civakê de bernade û hê jî ji bo azadiya her jinekê di civakê de têdikoşe.

Piştî şoreşa bihara ereba di sala 2011'an de, jinên ereb li dijî desthilatdarî, rêxistin û qanûnên ku wan sînordar dikin û rûmeta wan binpê dikin serî hildan. Ji be vê lez kir ku rola xwe ya rastîn û xwezayî bigire û cihê xwe di nav civakê de vegerîne, lewra di rêfên pêş de bû pêşeng, li dijî urf û edetan û zehmetiyan di rola xwe ya têkoşer û çalakvana aştî û demokrasiyê de parast. Ji ber têkoşîna jinê ji nêz ve bi berxwedan û azadiya li ser erdê ve girêdayî ye û wêneyê wê yê rastîn bi hevgirtin û yekkirina ref û hewldanên wê ve pêkane.

Pirseke ku her tim ji hemû ekranên medyayê ji min dihate pirsîn heye: Ev hêz û wêrekiya jinan ji ku derket? Bersiv ji zilm, neheqî û koletiya ku ji ber zîhniyeta desthilatdar û otorîter hatiye serê wê ye, ji ber vê yekê tevgera jinan hê jî heye û tevlêbûna wê ya di hemû qadan de berdewam e. Jinan di şoreşa azadiyê de pêşketinên mezin bi dest xistine, têkoşîna wan bi dijwarî û serkeftinê tije ye. Di rêya rizgariyê ji hemû rejîmên zalim û otorîter re, îsrar, biryar û îrade nîşan da. Rolên qalibên ku wê di civakê de kêm kiribûn ji holê rakir û karî di nava çend salan de xebatên xwe birêxistin bike, sîstema xwe ya demokratîk xurt bike û rêveberî, meclîs û desteyên xwe ava bike. pêşxistina têkoşîna azadiyê û avakirina pêşerojeke geş vê isbat dike. Rêber û ramanger Abdullah Ocalan, xwediyê Projeya Aştiya Demoqratîk dibêje: Şoreşa ku jin di nava refên xwe de nebe, bi ser nakeve .

Ser vî esasî  em ne tenê jinên Ereb, hemû jinên ji pêkhateyên din, dive em destkeftiyên şoreşa xwe biparêzin, şoreşa jinê ya ku bi xwîna şehîdên me pêk hatiye, destanên herî xweş ên lehengî û rizgariyê nivîsandin e. ji bo ku bigihêjin qonaxa aştiyê, pêwîste bi pêşengiya hişmendî û rêxistinbûyî ya ku karibe pêşengiya qonaxê bike, bingehê girseya jinê di nava hemû jinan de berfireh bike û bi rêxistin bike da ku bikeve rêya pêvajoya siyasî. Berxwedana jinê di dîrokê de gelek şoreş û bûyerên dîrokî yên girîng bi pêkaniye, lê ya ku wê herikîna dîrokê biguherîne ev şoreşa me ye. Bi saya yê ku jin analîz kir û di rêxistinkirina civaka me de cih da wan. Jina azad û berxwedêr îro riya ku em bigihêjin heqîqetê ye. Jinên Rojhilata Navîn tişta ku îro li ser jinê tê ferzkirin ev e. Ne bi qederê, lê bi destê rejîma otorîter a ku niha heye û zilamê heyî ji bo wê diyar kiriye, mirov dikare vê zihniyetê jî biguherîne û li şûna wê çi rast e diyar bike.

Ji ber vê yekê weke jin divê em şev û roj li ser riya serxistina vê şoreşê bixebitin. li ser esasê wê şoreşa jinê ji bo me ji her tiştî girîngtir e. Ji ber vê yekê divê em girîngiyê bidin jinên li derveyî xeleka rêxistina jina azade, û  divê em refên xwe xurt bikin û xebatên hemû jinan bikin yek, yekîtî û vîna jinan di têkoşînê de bi hemû pêkhateyan re derxîn pêş. Berxwedana li dijî modernîteya kapîtalîst û pergala baviksalarî ya dagirker û her tiştê ku têkoşîn û azadiya jinê asteng dike, wê bibe pêngavek li ser riya çareserkirina hemû pirsgirêkan û avakirina civakeke saxlem, exlaqî, siyasî û demokratîk ji bo pêşxistina şoreşê li Rojhilata Navîn.

## Rêwîtîya Têkoşîna Jina Kurd

Dr. Ebîr Hesaf - Endama Koordînasyona Meclîsa Jin a Bakur û Rojhilatê Sûrî

Di dîrokê de jinan di avakirina civakan û parastina nasname û taybetmendiya wan civakan de roleke pêşeng lîstiye. Jin di civakê her pêş bû û di qonaxên destpêkê yên dîroka mirovatiyê de zagonên civakê bi mafên xwezayî yên jinan dihatin diyarkirin, ku di nava xwe de zanîn û dilovanî, dadmendî û wekhevî dihewand. Lê piştî derketina sermaye û çînên civakî û cudabûna zayendî ku bû sedema parçebûna civakê, jin ji qonaxa civakî ya jiyanê hat derxistin û li pişt perdeya baviksalariyê hat veşartin.Di dîrokê de jin dikaribû pêşengiya gelan û artêşê bike, bibe kralîça û artêşên zilaman li gor fermanên wê tevdigeriyan. Li aliyê din jin di dîrokê de rastî koletî û heqaretê hatiye. Civak di gelek waran de ji hev cuda ne û aliyê herî balkêş ruxmî cudahiyên sosyo-antropolojîk, pozîsyona jinê ya di vê an wê civakê de ye. Ji ber ku pozîsyona jinê di civakê de rastiya wê civakê û lingê wê yê jiyanê, asta şaristaniyê û zîhniyeta wê derdixe holê.

Di netewên Rojhilata Navîn ên derdora gelê Kurd de, bala civaka Kurd bi taybetî li ser kesayetiya jina Kurd û rewşa wê ya di malbat û civakê de û helwesta mêrê Kurd li hember wê bûye. Ev jî bêguman bi taybetmendiyên erdnîgarî, dîrokî û çandî yên vê civakê ve girêdayî ye, ku bandor li avahiya wê ya civakî kiriye. Ji ber ku erdnîgariya çiyayî ya Kurdistanê têkiliya bi gelên din re sînordar kir û bû alîkar ku taybetmendiyên civaka xwezayî were parastin. Lê belê bandorên ji derve bandorek neyînî li ser rewşa jinan kir. Van faktoran nirxê jinê di civakê de kêm kir. Lê dîsa jî nekarîn bi tevahî nasnameya jinê ya di nava civaka Kurd de ji holê rakin, jin hîn bi rûmet bû û hin taybetmendiyên wê hatin parastin. Rojhilatnas Mînorîskî ku jiyana gelek gelên rojhilat nas kiriye wiha dibêje: “Di nav gelên îslamî de gelê Kurd herî zêde bi jinan re nerm e.” Dibe ku gotina wî di rewşa civakî û aborîyî ya hesan de rast be ku jina kurd heta asteke baş di van her du radeyan de azad bû, jiber ku bawerî û ramanên kurdan tevgera jinê li devera wê asteng nakin û rê li pêş nagirin ku pêşwazîya mêvanan bike, her çiqas zilam ne li malê be jî.

Ji hêla aborîyî ve jî jin li erd û zevîyan kar dikir û li hin deveran karê li zevîyan girêdayî wê tenê bû anku pisporîya wê bû ku dab û nerîtên kurdan rê li pêş karê jina kurd nedigirt û tu mercên zehmet li pêş karê wê danetanîn. Lê tevî vê azadî û xebata jinan di civakê de hem di warê aborî û hem jî di warê civakî de bisînor bû û dahata wê ya kedê bi piranî ji mêran re diçû û mafê wê yê biryardanê di derbarê malbata xwe de jî heta radeyekê sînordar bû. Ev tê wê wateyê ku jin di civakê de cihekî taybet digire, azadiya cil û berg û xebatê qebûl dike, lê ji ber desthilatdariya baviksalarî ya ku di civakê de serdest bû, azadiya tam napejirîne. Dema ku taybetmendiyên sosyolojîk ên civaka Kurd li her çar parçeyên Kurdistanê werin lêkolînkirin, diyar dibe ku statûya jinê ya civakî û pozîsyona wê çiqasî dişibin hev û ev jî girêdana xurt a di navbera her çar parçeyan de nîşan dide. Kurdistan ji sînorên siyasî yên ku li ser hatine ferzkirin zêde bandor nebû.

Her wiha jin ji qada siyasî ne dûr bû, ji ber ku di dîroka kurdan de jina kurd gelek caran seroka eşîr û gundê xwe bû. Ev nîşaneyek biçûk be jî, ev yek piştrast dike ku civaka Kurd rola pêşengiya jinê qebûl dike. Dîrok jî bi dehan navên jinên kurd bi belge dike; jinên mîna Mama Xatûn ku qirala dawîn ya malbata Dîlmî bû ku 30 salî bi lehengî û bi rengekî diblomasî warê xwe parast.

Her wiha Adila Xatûn jinbîya Osman Paşa Caf li bajarê Helebçeyê, xwedîya rewşenbîrîya bilind û kesayeta bihêz ku nasnava “Xan” di serdema serwerîya Brîtanîyayê li Îraqê di nîva sedsala nozdehem de bi dest xistibû. Fatimeya reş a ji bajarê Mereşê jî mînakek e. Wê bi 300 siwaran li Dîwana osmanî ya Stenbolê nûnertiya kurdan kir. Navê wê û yên gelekên din di pirtûkên dîrokê de cih girtiye. Bîra kolektîf ev qehremaniya xwe parastiye û îro jî bi gotina kurdan “Şêr şêr e, çi jin be, çi mêr be” tê naskirin.

Ger em li dîroka gelê Kurd a sedsala borî bişopînin, emê bibînin ku jina Kurd nêzî tevgera rizgarîxwaza netewî ya Kurd bû. Ji ber ku êşa wê du qat bû, yek ji ber ku ew jin bû û ya din ji ber ku ew jina kurd bû, û ev yek ji bo hişyarbûna jinan a ji bo azadiyê di destpêkê de bû sedemek. Ji ber ku jinên Kurd bi awayekî aktîf beşdarî jiyana siyasî û pêkanîna deshilatdariyê bûn, em dikarin li vir behsa hinekan ji wan bikin, weke Hebse Xan El-Neqîb, ku xwe di parastina doza Kurd de berpirsyar didît û piştgiriya hikûmeta Kurdistanê li Silêmaniyê dikir. Û bi hevalên xwe yên jin re doza mafê kurdan yê diyarkirina çarenûsa xwe kir. Li milekî din tevî ku sîyaset heta astekê rengekî malbatî wergirtibû, em dibînin ku gelek jinên Kurdistanê tev li partîyên sîyasî yên kurd bûne û di partîyên netewî û yên pêşverû de cih girtine her wekî partîyên komînîst weke Partîya Komînîst ya Îraqî. Di sala 1952yan de li başûrê Kurdistanê û bi rengekî veşartî Yekîtîya Jinên Kurdistanê hate damezirandin û piştî demek kurt hejmareke mezin ya jinana tevlî bûn, lê ev rêxistin di asta herî dawîn de man û ne xwedî serbixwebûna sîyasî bû. Lê belê jina kurd her dem li rex mêrê kurd di raperîn û şorşan de amade bû. Ger pişta mêrê kurd ji hevjîna wî ne rast bûya ku dikare karûbarên mala wî bi rê ve bibe û zarokan xwedî bike û malbatê biparêze, nikarîbû tev li şoreşan bibe.

Jina kurd piştî raperîna 1992yan li başûrê Kurdistanê gelek destekeftî bi dest xist. Ji ber doza jinê keta pêşîya projeya hikûmeta kurdî û bû mijareke pêşkarî ji bo hikûmetê piştî ku ji bendên Rêjîma Baas û sîyaseta wê ya çewisandinê û terora ku der heqê jinan rizgar bû. Ji encama guhartinên demokratîk û sîyasî li herêmê, pirsa jinê ji hêla beşdarbûna li qada sîyasetê û warên din yên jîyanê giringiyek stand. Beşdarîya jina kurd di qada sîyasetê de bi rêya tevlêbûna wê li rêxistinên civaka sivîl û refên partî û rêxistinan û di biwara leşkerî de jî derkete pêş. Li gorî parlementoya Iraqê û parlementoyên hemû dewletên Rojhilata Navîn, beşdariya jinan di parlementoya Herêma Kurdistanê de zêdetir e û %25 e. Ji ber ku ji sala 2009’an û vir ve kotaya %30 heye, jinên Kurd di sala 2013’an de ji 111 kursiyan 34 kursî bi dest xistin. Ev jî ji bo jinên Kurd pêşketinek e, ji ber ku di navbera salên 1992-2005 de jinan tenê %7 kursiyên parlementoyê bi dest xistin.

Tevî zordarî û tundiya ku dewleta Tirk li gelê Kurd kiriye da ku gelê Kurd ji xewn û siyaseta wan ya netewî dûr bixe jî, jina Kurd li Bakurê Kurdistanê ji qada siyasî dûr nebûye. Siyaseta tirkkirinê, qedexekirina ziman û çanda kurdî, guhertina navên kurdî, ev hemû tedbîr ji bo tunekirina nasnameya kurd bûn, lê ji ber vîna jina kurd hemû têk çûn. Jina ku di dehsalên şoreş û serhildanên sedsala 20’an de zarokên xwe ji hestên netewperezi parastiye û nasnameya kurdî parastiye û mil bi mil bi mêran re di nav tevgerên azadîxwaz û partiyên siyasî de cih girtiye. Partiya Karkerên Kurdistanê partiya herî diyar bû ku di salên 1970î de dest bi tevgereke siyasî û pêşverû ya keç û xortên Kurd kir û piştî ragihandina şerê çekdarî, bi hezaran jinên Kurd tevlî refên wê bûn. Van jinên Kurd çek hilgirtin û ji bo parastina welatê xwe rabûn ser piyan û hişt ku qonaxeke nû ya têkoşîna jinan dest pê bike ku tê de hêzên leşkerî bi pêşengiya jinan hatin avakirin, ku di

dîrokê de rewşeke kêm û ne asayî bû. Yekemîn tevgera jinê ya siyasî ku daxwaza azadiya jinên Kurd û mafên wê dikir derket holê û vê tevgerê bandor li hemû jinên Kurd ên her çar parçeyên Kurdistanê kir. Ji ber ku her çend bi sedan jinên Kurd bi îşkenceyê an jî bi dehan jinên Kurd di nav de Sekîna Cansiz û hevalên wê hatin qetilkirin û her çend bi hezaran jinên Kurd siyasetmedar ên weke Leyla Guven di girtîgehên Tirkiyeyê de bin jî, em dibînin ku bi hezaran dayikên aştiyê li ber xwe didin pêşia maşîna kuştinê ya tirkan û bi dehan parlamenterên kurd ên jin li parlamentoya Tirkiyê rawestiyane û daxwaza mafên xwe yên netewî û mafên jinan dikin û bûne sembolek ji bo jinên azadîxwaz ên xwedî ramanên pêşverû.

Li Sûriyê jina Kurd ji qada siyasî ne dûr bû û di destpêka damezrandina partiyên siyasî yên Kurdî de di nîveka salên 1950'an de, jinên Kurd di nava refên van partiyan de rolek aktîf lîstin. Beriya wê jî cihê xwe di nav partiyên pêşverû de hebû, wek mînak di Partiya Komunîst a Sûriyê de, ku Kurd bi armanca mafên wekhev tevlî wê bûn. Her wiha di nava rêxistinên jinan ên weke Komeleya Jinên Sûriyeyê de ku di destpêka salên 1940'î de hat avakirin de cih digirin. Di nîveka sedsala 20an de navên hinek jinên Kurd derket pêş, wek Rewşen Bedirxan ku di sala 1947an de di kongreya Qahîreyê de nûnertiya Sûriyê kir û di sala 1955an de bi damezrandina rêxistina "Encûmen" bi çend jinên têkoşer re çanda kurdî zindî kir. Di kongireya jinavbirina teror û nijadperestiyê 1975 ku li Yûnanistanê hatibû lidarxistin, jina kurd ya tekane bû ku li wir hazir bû û nûnertiya gelê xwe dikir. Jina kurd li Sûriyeyê dûr ji karê siyasî neket, carcaran bi beşdarbûneke şermok, carcaran bi awayekî aktîf û carinan jî beşdarbûna wê bi awayê peyrewî ji xeta siyasî ya malbatê re bû û di warê biryardana li ser karûbarê jinan de qels bû, û bi vê jî Yekîtiya Jinên Kurd û Yekîtiya Jinên Kurdistanê û hin rêxistinên din peyda bûn. Di sala 2005'an de damezrandina Yekitiya Star ku niha bi navê Kongra Star tê naskirin, weke şoreşek di qada rêxistinkirina jinan a siyasî, civakî û îdarî de ye. Tevgera jinê armanc dike ku jineke ava bike ku mafên xwe bizane û beşdarî xebatên siyasî û biryardayînê bibe. Niha Kongra Star bi deh hezaran endam hembêz dike.

Jina kurd rastî gelek zilm û tepeserîyê çi ji hêla civakê û çi jî ji hêla rêjîmên serdest ve, hatiye; lê serwextî û baweriya wê bi karîn û şîyanên wê du faktorên sereke bûn ku hiştin ku jin cihê xwe dagire û bikare astengiyan derbas bike û xwe isbat bike her wiha rêxistinên xweser damezirîne û hêviyê bide jinên pêkhatin din yê herêmê. Di nava hemû nakokî û tevliheviyên ku di destpêka aloziya Sûriyê de derketin, jinên Kurd Yekîneyên Parastina Jin ava kirin, ku di rizgarkirina Kobanî û herêmên din ên bakur û rojhilatê Sûriyê de şerekî mezin kir û karî efsaneyê Daiş ji holê rake. Her wiha dayikên Kurd di nava Hêzên Parastina Civakî de li dijî êrîşên li ser civaka xwe li ber xwe didin. Bi awayekî parlel li ser astên siyasî, îdarî û hiqûqî jî, gelek destkeftî bi dest xwe ve anîn û di encamê de qanûna jinê, sîstema hevserokatîyê, derbaskirina asta kotayê ber bi prensîpa nîvenîve ve peyda bûn, her wiha mal û desteyên jinê jî ava bûn û jin beşdarî biryardanên siyasî û îdarî bû; zêdeyî vê jî, jinê karî pirên peywndiyê di navbera pêkhateyên herêmê de ava bike û ew han dan ku rêxistinên xwe yên xweser ava bikin ku êdî karîn eniyeke jinan ya herêmî û destpêşxeriyên jinan çêbikin û di avakirina civakeke demoqirat de bû xwedî roleke girîng.

Tevî hemû qezenc û bidestxistinan, lê hîn em di destpêka rê de ne. Tevî ku jêderên wê jêk cuda ne jî lê doza jinê her yek doz e; çimkî azadî, maf û rûmet têgihên hevtemamker, yekgirtî û jênegir in û heta ku jinek li ser rûyê erdê di bin zilimê de be, dê tekoşîn berdewam be.

## Bandora şoreşê li ser pêşveçûna têkoşîna jinan çi ye?

Selwa Gîge - Nûnera Tûnisê ya şebekeya jin a Efrîqê FemWise

Silavên min ên şoreşgerî ji bo hemû beşdarên vê forûma yekemîn a şoreşa jinan li Bakur û Rojhilatê Sûriyê dişînim. Ez ê îro di vê forûme behsa asta bandora şoreşê li ser pêvajoya têkoşîna jinan bikim. Ez her tim tercîh dikim ku li şûna "jinê" li ser "jinan" bipeyivim, da ku prensîba mafê cudabûn, cihêrengî û pirrengiyê di ber çavan re bigirim û ji qalibên ku em dixwazin wan derbas bikin, dûr bikevin. Ji bo ku mijar bikeve çarçoveya tegîhna rast konsepta şoreşê were danasîn. Em bi gîştî ne behsa "şoreşê" dikin, lê belê behsa "şoreşa jinê" dikin. Ji bo tekezkirinê, wek nimûne li Tûnisê, tiştê ku wek şoreş hatibû hesibandin û bi navê "Bihara Erebî" hat naz kirin di rastiyê de ne wisa bû. Mirov gotiba "deh salên reş" ku civak jiyan kir bêhtir di cîh de ye. Serhildana 2011'an bi nêrîneke şoreşgerî nehat destpêkirin û sîstemeke demokratîk a rasteqîn ji bo armancên cîvakê bi dest nexistin. Slogana xwepêşanderan "Kar/ Azadî/Rûmeta Netewî" bû. Şoreşa rastî di çarçoveya vê serhildanê de ye, di şoreşa jinê ye. Ez ê hewl bidim ku bandora serhildanê li ser pêvajoya têkoşîna jinên Tûnis û herêmê nîşan bidim.

Ji bo vê mînaka herî baş jî gotina Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan e ku dengê wî ji pişt dîwarên girtîgehê bilind dibe. Ew cudahiya di navbera têkoşînên berê û niha de nîşan dide. Sedsala nozdehan bû sedsala partiyên bûrjûwazî, û sedsala bîstan jî sedsala partiyên kedê bû. Sedsala bîst û yekê wê bibe sedsalek ji bo partî û rêxistinên ku azadiya jinê û têkoşîna jine di navenda xwe de dihawînin. Azadiya jinê bi pirsgirêkên çandî û ekolojiyê ve girêdayî ye. Wekî din, pirsgirêka jinan bi mijara mafên zarokan, pirsgirêkên tenduristiyê û pirsgirêkên perwerdehiyê ve girêdayî ye. Bi nêrîna Abdullah Ocalan pirsgirêka jinê ji rastiya çîn û neteweyê girîngtir û ji wan berfirehtir e.

Divê were zanîn ku jin ji tevahiya civakê hatiye dûrxistin û di asta herî jêr de ye. Azadiya civakê bi azadiya jinê dest pê dike. Em di qonaxeke dîrokî re derbas dibin, ji civakê heta siyasetê, ji aborî heta hawirdorê di gelek qadên jiyanê de guhertin pêk tên. Tişta ku guhertina diyar bike asta rêxistinbûn û têkoşîna bi pêşengiya jinê be. Bi pêşengiya jinê azadî, demokrasî, wekheviyeke bi bandor û jîngeheke saxlem dikare bi ser bikeve.

"Pergala Nû ya Cîhanê" bi girêdana xwe ya nêz a bi pergala baviksalarî re, rûyê xwe yê rast nîşan dide. Ev "Pergala Nû ya Cîhanê" bi mebesta berfirehkirina bandora xwe û serdestiya li cîhanê ye, ji Afganîstanê dest pê dike, piştre Iraq û Bakurê Afrîkayê û herwiha Rojhilata Navîn - bi taybetî herêmên Kurdistan, Sûriye û Iraqê. Ji bo avakirina serdestiyê hem şer û rabûna rejimên rastgir wê werina bikarhanîn. Em dibînin ku li hember destkeftiyên yên bi têkoşîna dijwar hatin bi dest xistine, îstîsmar û êrîşên sîstematîk zêde dibin. Niha bi milyonan mirov bûne penaber û ji malên xwe hatine derxistin, yan jî li herêmên şerê çekdarî dijîn. Di êrîşên sîstematîk ên hêzên hegemonîk de mînaka herî baş a nakokiya Rûsya û Ûkraynayê ye.

Tişta ku em di encama van şert û mercan de dibînin, zêdebûna rêjeya şîdeta li ser jinê ye, di nav de tundiya zayendî û kuştina jinan. Lê em dibînin ku êdî jin dengê xwe bilind dikin. Ev jî wan dike hêzeke şoreşgerî ya bingehîn û gefeke mezin li ser hebûna rejîmên otorîter. Em dikarin bibêjin ku têkoşîna jinê têkoşîna herî berfireh e ku bi demokrasiya rast û rûmeta mirovahiyê ve girêdayî ye. Têkoşîna jinê sînoran ava nake, wan derbas dike. Têkoşîna jinê dikare di nava tevgeran de roleke pêşeng û dîrokî bilîze. Jinan li Rojava ji bo xweparastinê, ji bo parastina xakê û ji bo parastina azadiyê çek hildan. Jinên

Rojava ji bo parastina azadî û rûmeta xwe bêyî tirsa mirinê li dijî DAIŞ'ê şer kirin. Ev helwestên ku di hemû jinên Rojhilata Navîn û Bakurê Efrîqayê de hestek hêzê derxistiye holê. Wan bandor li îmaja xwe ya jinan kir, nîşan da ku jin çawa dikarin xwe biparêzin. Jinan her wiha gelek jinên Êzidî ji destê DAIŞ'ê rizgar kirin. Vê yekê nîşan da ku dema jin birêxistin bibin, ji koletiya nefret bikin dikarin bibin bersiv ji bo bazirganiya laşê jinan re ku wekî malên zayendî ku qedera gelek jinên Êzidî û Ermenî bû.

Tişta ku li welatê me jê re "şoreş" tê gotin, berovajî vê yekê ye. Li şûna azadiyê em dikarin cîhad û jinên Tûnisî yên ji bo bi cîhadiyan re bizewicin dişînin Sûriyê bibînin, ev yek ji têrkirina xwestekên zayendî yên şervanên di nava refên DAIŞ'ê wêdetir nîne. Ev islama siyasî ye ku hêzên sermayedar ên rojavayî bi teşwîqkirina vejandina komeleyên olî û avakirina mizgeftan ji ber belavbûna nexwendewariyê û kêmbûna saziyên perwerdehiyê piştgirî dikin, ev yek ji wan re bûye alîkar ku bigihîjin desthilatdariyê.

Ma hêzên kapîtalîst ên emperyalîst bêyî ku nîvê nifûsa herêmê desteser bike, dikare bandora xwe li ser welatên me berfireh bike? Çêkirina desthilatdariyeke navxweyî ya ku jinê desteser dike, yek ji aliyên plana stratejîk bû ku van hêzan bi desteka Îslama siyasî pejirandiye. Ev jî cewherê qonaxa ku Ocalan destnîşan kiriye, li ser rola jinê disekine. Bê şik tevgerên jinan di bin tesîra hev de ne, lê li her welatekî sekneke taybet heye. Ji bo koordînasyon û avakirina hêza jinê xebat hatin meşandin. Hevbendî li ser asta neteweyî, herêmî û heta cîhanî derketin holê.

Civîna ku di sala 2013'an de li Kurdistan, Amedê pêk hat, bi bîr tînim. Ev hevdîtin bû bingehê avakirina tevgera navneteweyî ya jinan a serbixwe. Konferansa Jinan a Cîhanê bersivek bû li dijî dûrxistina jinên Kurd ên Neteweyên Yekbûyî di Civîna Jinan a Navneteweyî ya ku li Awûstralyayê hat lidarxistin de. Vê tevgera gerdûnî ya serbixwe dest bi ferzkirina hebûna xwe kir bi rêya konferansa ku di sala 2016'an de li Nepalê hat lidarxistin, û ya ku dê meha bê (3-10-ê Îlona 2022) li Tûnisê were lidarxistin.Ev yek nîşaneya eşkere ya hevgirtina jinan di asta cîhanê de ye û nîşaneya nerîna stratejîk e ku me di civîna Diyarbekirê de destnîşan kiribû, dema me ragihand ku divê sedsala 21ê bibe sedsala pêkanîna wekheviya bibandor a di navbera hemwelatiyên jin û mêr ên li welatên cuda yên cîhanê de.

Di çarçoveya vê nêrîna berfireh de, ez dixwazim tiştên ku têkoşerên jin li Lîbyayê piştî şoreşê jiyane û piştgiriya me ji wan re bînim ziman. Cihê mixabiniyê ye ku parêzera mafên mirovan Henan el-Barasî piştî ku gefên kuştinê li wê û keça wê hatin, hat kuştin. Ew bi berevaniya mafên mirovan, eşkerekirina dosyayên têkildarî gendelî û sextekariya darayî, û herwiha bi belgekirina tundiya zayendî ya li dijî jinan li Bîngazî û têkiliya komên çekdar di vê dosyeyê de, tê naskirin. Kuştina Henan El-Berasî piştî wendakirina parlamenter Sîham Sergewa tê ku li Bîngazî ji aliyê komek çekdar ve hatibû revandin. Ji hingê ve ew nehatiye dîtin. Piştî kuştina parêzera navdar a mafên mirovan û parêzvana mafên jinan Salwa Bugaighis ji aliyê kesên nenas ve di 25ê Hezîrana 2014an de hat revandin. Revandin û kuştin, beşeke ji kiryarên tundûtûjiyê, tolhildan û tirsandinê ku ji aliyê komên çekdar ên çete ve têne kirin, da ku nîvê civakê bindest bikin û hêzên serdest karibin welat bixin bin destê xwe û dewlemendiya wê kontrol bikin.Têkoşîna jinan a di van şeran de gelek caran tê paşguhkirin, lê hêja ye ku li Lîbyayê û li hemû welatên herêmê girîngiya têkoşîna jinan bê bilindkirin. Girîng e ku nirxa van têkoşînê di bidestxistina destkeftiyên jinan de ku

karîbûn destkeftiyan bi dest bixin, were destnîşankirin. Jinan li gelek welatên herêmê di serî de Lîbya û Tûnisê gelek erkên siyasî girtine ser milê xwe.

Tûnis, berî sala 2011'an, ku bi tiştên ku Qanûna Rewşa Kesane ji bo jinên Tûnisî kiribû, dihat naskirin, wek qedexekirina pirzewacê ji sala 1956 û vir ve û perwerdekirina gerdûnî û mecbûrî ji bo her kesî (jin û mêr) heta temenê 16 salî. Ji ber wê jî rêjeya xwendinê di sala 2010 de %99 derbas kir. Hilweşîn di sala 2011'an de bi destberdana zû ya perwerdehiyê dest pê kir, ku salane giha 120 hezar qutbûnê. Em ê behsa hewldanên têkçûyî yên ku destûra bingehîn a 2014'an ber bi kêmkirina mafên jinan ve birin? Li Tûnisê kuştinên siyasî hatin kirin û şehîd Çokrî Belîd û şehîd Mihemed El-Brahmî û yên din hatin kuştin, lê şer weke ku li Sûriyê qewimî ne çekdarî bû. Nakokî di navbera ramana îslamî ya paşverû û ramana modernîst a ku bi mafên takekesî û kolektîf ve girêdayî ye îdeolojîk bû.

Avakirina tifaqan di çarçoveya tevgera femînîst û pêşverû de, di têkoşîna civak, jin û mêr de, ji bo avakirina civaka sivîl û avakirina zagonên li ser esasê wekheviyê, hêmaneke sereke bû.Ez ê çend mînakan bidim. Di salvegera derketina Rojnameya Rewşa Kesane de, di 13'ê Tebaxa 2011'an de ji bo daxwaza mafên xwe me mîtîngên mezin li dar xist. Di 13'ê Tebaxa 2011'an de em 5 hezar di şahiya salvegerê de bûn. Lêbelê, ew pîrozbahî hişyarkirina xetere ji bo îslama siyasî bû.  Di 13'ê Tebaxa 2012'an de dema ku me nûçeyên hewldana parlamenteran a ji bo bisînorkirina mafên jinan hatin girtin em 50 hezar li kolanan bûn. Encûmenê di makezagonê de xalek pêşniyar kir ku "têkiliya temamker a jin û mêr di çarçoveya malbatê de." Dema ku me daxwaza wekheviyê dikir.

Di Tebaxa 2013'an de em 500 hezar jin û mêr li kolanan bûn û daxwaza pêkanîna prensîba "Wekheviya welatiyên jin û mêr" kirin. Ev civîn di heman demê de pêk hat ku me daxwaza hemû mafên mirovan kir û me pêşniyar pêşkêşî Meclîsa Damezrîner kir. Me bi vî awayî nûnertiya hêzeke pêşniyar û hêza zextê ya ji bo destûra bingehîn a mafên xwe kir. Ev meş bû bingehê pêkanîna van mafan di destûra bingehîn a 2014'an de.  Bê şik her binpêkirina van mafan dê di pêşerojê de bibe sedema kombûneke nû ya hêzan, ji bo sepandina wekheviya tam di navbera jin û mêr de.

Vê têkoşînê di derxistina Qanûna Bingehîn a Têkoşîna li dijî Şîdeta li Ser Jinê jî alîkariya me kir. Ev zagona 2017'an e. Hêzên civaka sivîl ji bo ronahiyê bibînin seferber bûne, tevî ku di navbera metnên qanûnî û rastiyê de ferqek hebe jî. Her wiha bi deh hezaran kes ji bo pejirandina projeya parastina maf û azadiyên takekesî ku "wekheviya mîrasê" di navbera jin û mêr de pêk tîne daketin kolanan. Tevî ku proje ji aliyê serokê nemir Becî Caid Essebsî ve hat pêşniyarkirin, lê şer hîn berdewam e, û xebat ji bo guhertina zihniyetê û perwerdekirina çanda hemwelatîbûn û wekheviyê berdewam e. Ev ji bo qonaxa paşîn girîng e. Ya girîng hewldanên hevgirtî, xebata hevbeş, pevguhertina pisporî û ezmûnê û pêşkeftinê ye. Me serkeftin bi dest xist û stratejî û armancên bi kalîte, di dema kurt, navîn û dirêj de destnîşan kir.

Ev yek ji bingehên bingehîn e ku sedsala 21'an bibe sedsala bidestxistina wekhevî û ji holê rakirina cihêkarî, nijadperestî û rêzgirtina ji azadiyê re di çarçoweya cûdahiyê de. Çawa ku sedsala berê bû sedsala rakirina koletiyê, bila sedsala 21'ê mîn jî bibe sedsala wekheviya hemû însanan û herwiha bibe sedsala rakirina hegemonyayê û avakirina derfetên wekhev di nav hemû welatên cîhanê de. Li vir em careke din di dilê nêrîna Abdullah Ocalan de ne.

## JIYAN TOLHILDAN, ROJ XABÛR Û BARÎN BOTAN



Şehîd Jiyan Tolhildan di sala 1982'an de li gundekî Efrînê ji dayik bûye. Weke hemû civaka xwe, ew jî bi cudakariya dij-kurd di temenek biçûk hîs kir. Jiyan ji biçûkatiya xwe ve di nava berxwedana jin û gelê Kurd de cih girt. Fermandara YAT'ê bû û ji pêngavên destpêkê yên şoreşa Rojava heta di avakirin YPJ'ê û di fermandariya YAT'ê li hemû qadên şoreşê xwedî xebateke bêhempa ya rêxistinkirina gel a ji bo şoreşê bû.



Şehîd Roj Xabûr di sala 1992'an de li Dirbêsiyê ji dayîk bûye. Ji destpêka şoreşa Rojava ve îlham girtiye û bi awayekî aktîf beşdarî wê bûye. Roj fermandara YPJ'ê bû û pêşengiya hemleya rizgarkirinê ya li dijî DAIŞ'ê dikir.



Şehîd Barîn Botan di sala 2003'an de li herêma Ehrez a Kantona Şehbayê ji dayik bûye. Ew zaroka sêyemîn di malbatek pênc kesan de bû. Barîn di malbateke girêdayî welatê xwe de mezin bû. Di ciwaniya xwe de tevlî şoreşa jinan a Rojava bû. Endama YAT - Yekîneyên Dijî Terorê bû. Barîn xwestiye hemû jinan ji bindestiyê rizgar bike û her tim tekez kiriye ku divê jin jiyana zalim û desthilatdar a mêran qebûl nekin.

KONGRA STAR
مؤتـــمر ســـتار


Peywendî
Webpage: Kongra-star.org
Email: Info@kongra-star.org
Twitter: starrcongress



Tîrmeha 2023